welat

Sal:3 Hejmar:106 27 Reşemî–5 Adar 1994 10.000TL (KDVD) **Rojnameya Hefteyî**

## DEP ji hilbijartinê vedikişe

■ *Partiya Demokrasiyê piştî civîn û lihevrûniştinan qerarê vekişîna ji hilbijartinê da. Qerar bi raya gelek endamên Meclîsa Partiyê hate dayîn. Sebebê vekişîna ji hilbijartinên 27'ê Adarê jî bi "nemanbûna meşrûiyeta hilbijartinê" ve hate girêdan û tê daxuyandin ku ji bilî vê biryarê jî, tu riya ku tê de herin nemaye.*

Rûpel 5

# Li Qudusê Navenda Çanda Kurdî

■ *Têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd, di demeke kurt de berê xwe pirr fireh kir û bû sebeb ku hemû Kurd li mafên xwe bigerin, saziyên xwe ava bikin û dengê xwe bigihînin çar aliyê dinê.*

■ *Ne tenê Kurdên ku li ser axa Kurdistanê dijîn, yên li welatên din jî bi xwe hesiyane. Hin ji wan Kurdan jî li Îsraîl dijîn. Piştî Kurdên welatên Sovyeta berê û yên Ewrûpayê, niha jî yên ku li Îsraîlê dijîn bi rêxistin dibin.*

■ *Di dawiya sala 93'yan de li Qudusê Kurdan, tevî dostên xwe yên yahûdî rêxistineke çandî avakirin. Niha ev rêxistina bi navê Civata Dostanî ya Îsraîlî û Navenda Çanda Kurdî xebat û çalakiyên xwe dorfireh û xurt dike.*

Rûpel 8



**RENGÊ AWIRÊN ZAROKAN**

Awir hene/ tewre tewre/ Awir hene/ tijî xem in/ Awir hene/ xweş û germîn/ Ji hinekan tê tirsîn/ Hinek hene tijî pirs in/ hinek ji van bi evîn in/ hinek hene pê tê kenîn/ Xorto!/ rengê awirên te çi ye?/ Zêde awirên xwe tûj neke/ Wê ji te bitirse Apê Sîleman/ Û kumê xwe hilde, biçe!


*Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan:*

# 'Rista Tirkiyeyê polîsî ye!'

**Moskov, Welat–** Li Moskovê konferanseke bi navê "Konferansa Dîroka Kurdistanê" roja 22'ê Reşemiyê dest pê kir û 3 rojan dom kir. Li gorî nûçeyên ku ketine destê me ev konferans ji aliyê Komîteya Kurdistanê û Wezîrê Dewletê ji bo Karên Polîtîkayên Hindikahiyên Neteweyî û Polîtîkayên Herêmî yê Rûsyayê ve, hatiye lidarxistin.

Wezîrê Dewletê yê ji bo Karê Hindikahiyên Neteweyî û Polîtîkayên Herêmî Vladîmîr Shîmshîrov (Şimşîrov) û Serokê Komeleya Kurdên li Rûsyayê Yura Nabiyev beşdarî vê konferansê bûn. Ji bilî van kesan, Kurdên Ermenîstanê, Kazakîstanê û Rûsyayê beşdar bûn. Konferans bi mesajeke Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, ku ji aliyê Kamran Hasan (Kurdê Bakur) ve hate xwendin, dest pê kir. Öcalan di vê mesajê de wiha dibêje: "Tirkiyeyê li herêmê rista polîsiyê hilgirtiye ser girmilkên xwe, hêzên Rojavayî jî çavên xwe ji jenosîda ku li ser Kurdan tê meşandin re digirin. Ji ber vê yekê em dibêjin ku, ew hêz bi awayekî nerasterast di nav vî şerî de ne." Roja çarşemê Kurdologê Rusî Michael Lazarof, gotarek pêşkêş kir û di vê gotarê de li ser hinek xalên polîtîkî rawestî, bal kişand ser girîngiya û pêdiviya têkiliyên baş di navbera rêxistinên Başûrî û PKK'ê de. Roja dawîn piştî civînê, Nûnerê ERNK'ê civîneke ji bo çapemeniyê li dar xist.

Li ser vê konferansê, KT ket nav keftelefteke dîplomatîk, hikûmeta Tirk Balyozê Rûsyayê vexwend maqamê xwe û jê agahî xwestin. Tê gotin ku, Rûsya dixwaze pirsgirêka Kurdî bi şêweyekî siyasî çareser bibe.



## Di şevên çandî yên DEP'ê de rengên Kurdistanî

Rûpel 11



## 'Li Moskovê berf dibariya ew li Kurdistanê dicemidîn'

Rûpel 16

# Rojnameya Welat dengê me ye

Hevalê rojnameya Welat û nivîskarê delal, berî hemû tiştî ez silavê xwe yê germ û şoreşgerî li we hemûyan dikim. Ez daxwaza serketin û serfiraziya we dikim û rojnameya Welat dengê me ye. Qutkirina Welat, qutkirina dengê Kurdan e. Ji ber vê yekê Welat di demeke zor de dijî û jiyana xwe berdewam dike.

Lê, bîr û baweriya me ew e ku, berxwedan jiyan e û ji ber vê jiyanê emê jî li ber xwe bidin.

Birano, ev bûye çend name ku min ji we re şandine. Lê ne nameyê min û ne jî şiîra (helbesta) min di Welat de derneketine. Dîsa ezê vê nameya xwe ji bo we bi rê bikim, ez hêvîdar im ku bigihîje destê we.

"Mêr ketine kewaran jin çûne hewaran." Ev gotinek kevin a Kurdan e. Belê di 1.2.94'an de Tansu Çîller Xanim û Benazîr Butto Xanim çûne Bosna–Hersekê; ji ber şerê di navbera Boşnak û Sirpan de. Herdu serokwezîrên dewletên misilmanan dibêjin: "Em wek du serokwezîr hatine lê belê, em du dayîk in, ji ber ku cerg û mêlakê dayîkan zû diperitin. Hatina me ji bo dîtina halê we ye." Gelo rast e ku ev herdu xanim ji bo dîtina wan çûne. Çi armanca Çîller di çûnê de heye. Dewleta Tirkiyeyê nikare xwe çareser bike wê çawa here derên xerîb çareser bike? An jî gelo rejîma Tirkiyeyê dixwest ku Tansu Xanim li wir bidin kuştin. Û bi vê yekê qala Tirkiyeyê di dinyayê de bikin. An jî eynî tişt ji bo Butto Xanim re jî mirov dikare bibêje. Ku wê jî wek bavê wê bikujin. Bi rastî ne dûrî aqil e. Belê zor û qetlîamên ku li ser Kurdan têne kirin, gelo Butto Xanim nabîne an jî di 88'an de qetlîama Helepçeyê, bi hezaran Kurd bi bombeyê kîmyewî qetil kirin. Yan jî di Newroza 92'an de bi sedan Kurd qir kirin yan jî qetlîamên Şirnexê, Dîgorê, Amedê, Licê. Bi hezaran gund û bajarên Kurdan xera kirine û bi sedan kes ji gelê me di bin perda kontrgerîla de dane kuştin. Bi hezaran zarok, pîr, kal û jin di bin îşkence û lêdana de winda dikin. Kalê wek ronakbîr Musa Anter li Amedê bi destê pîs û qirêjên xwînmijok de hate kuştin.

Yan jî berî du–sê rojan dewleta Tirk bi firokên xwe bi hincetan, êrîşî qada Kurdan kirin û gelek gundiyên Kurdistana Rojhilat kuştin û birîndar kirin. Gelo Butto bi van jî nehisiyabû? Li pêş çavê cîhanê, tevî dewletên dagirker van qetlîaman dikin lê, kes ji wan qala mafên mirovan nake. Heke ku şûrkêşên dewleta Tirk û Pakîstan natirsin, bila ew biçin Bosnayê, çima jinên xwe dişînin? Yan "Mêr ketine kewaran, jin çûne hewaran" mîsala vê çûnê jî ev gotine.


Dewleta Tirk ew kirinên ku ew in li jor rêz kirine, dibe nava dinyayê û di bin navê têkoşîna bi terorê re wan wek tiştekî rind rê dide. Ji Kurdan re dibêje "terorîst" lê gava ew van kirinan dike navê wê nabe terorîst. Petrola me, nîsk, maden, komir, zêr û zîvê me dixwe û talan dike, çima ew nabe terorîst?

Gava me zozanê wan, dehl û rezên wan, pezê wan talan bikirana, me dê bigota em zilm û zorê li wan dikin.

Yê birçî, yê feqîr, yê bindest em in. Çima em terorîst in. Ma kew û kîvroşkên me, teyr û qijikên me jî terorîst in ku hero–duro bombe dikin.

Lê belê, îcar bila ew ji me re bibêjin terorîst, bibêjin komunîst, bila bibêjin Ermenî, çi dibêjin bila bibêjin, ji ber ku em dozekê dikin û dimeşînin. Heke çi bibêjin jî em dev ji doza xwe bernadin. Heta ku yek ji me Kurdan hebe, em nadin paş. Ji ber ku me bi hezaran şehît dane. Êdî vegera bi paş ve nîn e. Heta niha me digot em û Tirk bira ne. Birayê ku min talan bike, birayê ku gund û bajarê min vala bike, birayê ku hebûna min înkar bike, bila ew bira nebe. Min wî navê. Bi rastî jî tu biratiya wan tune ye ku, ne em bi destê xwe serê xwe nexurînin, bi destê kesî xwira mirov naçe.

***Mehmet Salîh Alptekîn***
***Dalîn Midyad***



## Cengîz Altun

Tu şehîdê yekemîn bûyî,
lê destên qirêjî yên ku xwîna te rijandin, piştî te jî gelek stêrkên geş vemirandin.
Li ser xaka Kurdistanê ya ku xwîna rijiyabû, niha jiyanek ava dibe. Em te ji bîr nakin, tu yê her bijî Cengîz.

***Xebatkarên Özgür Gündemê yên buroyên Kurdistanê***

**EY PAKREWAN!..**
Hingî mirina bêbihar
ku hat konê xwe li ser
çavên te yên wek kabeya rojê danî,
Ji wê rojê pê ve em
di bin siya meziniya te de
xwe diparêzin,
Ji nû ve jîndar dibin bi
nalînên te yên jankuj....
Hingî mirinê ku
hembêza xwe vekir
tu di nav xwîngulan de
diyarî axa Welêt kirî,
Ji wê rojê pê ve
me navê "mirinê" jiyan
navê "têkoşînê" Cengîz danî
Ey pakrewan!...
Tu bêxem razê
em giş amade ne ji bo "mirinê".

***Xebatkarên Rojnameya Welat***

# Nivîsara Welat

## Rengê mirovî û hemdem

Cihê ku lê demokrasî û mafên mirovan tune, an jî pirr bi sînor e, xebat û faaliyetên mirovî, çandî, zanistî yên ku mirovahiyê li pêş dixin di şertên kambax û dijwar de tên pêkanîn. Yên ku îktîdar di destê wan de ye, bi awayên cur be cur astengî û tengehiyan ji van xebatên mirovî re derdixin û rê li ber çalakiyên pêşverû digirin. Weşandin û xwendina Welat yek ji wan karên pêşverû û şoreşger e. Em her cure têkoşîna li hember pest û zordestiyê pêwist, girîng û hemdem dibînin. Îro li gelek deverên dinyayê bêhejmar tevger, sazî û kes li dijî her cure helwestên ku rê li ber bajarvaniyê digirin, hene û têdikoşin. Awa, cih, navgîn û mezinahiya van têkoşîna her çendî cihereng bin jî, reng û armanca wan yek e; giş li dijî zilmê û ji bo pêşveçûyînê ne.

Ji holê rakirana zimanê gelekî û asîmîlekirina neteweyekî karekî zordest û dijmirovî ye. Her cure têkoşîn û kêferatên li hember vê zordestiyê pêşverû, hemdem û mubah e, rengê wê jî mirovî ye. Welat wek dengê neteweyekî ku bi sed salan di bin nîrê kedxwariyê de hatiye mêtin û zimanê wî hatiye qedexekirin, navgîneke têkoşîna li dijî zordestiyê ye. Ji ber vî rengê wê yê hemdem û mirovî, rê li ber çalakiyên Welat jî tên girtin.

***Ji holê rakirana zimanê gelekî û asîmîlekirina neteweyekî karekî zordest û dijmirovî ye. Her cure têkoşîn û kêferatên li hember vê zordestiyê pêşverû, hemdem û mubah e, rengê wê jî mirovî ye. Welat wek dengê neteweyekî ku bi sed salan di bin nîrê kedxwariyê de hatiye mêtin û zimanê wî hatiye qedexekirin, navgîneke têkoşîna li dij zordestiyê ye. Ji ber vî rengê wê yê hemdem û mirovî, rê li ber çalakiyên Welat jî tên girtin.***

Ji bo rojnameyekê belavkirin û xwendin, di girîngiya dereceya yekemîn de ye. Ger rojnameyek neyê belavkirin û ji hêla gelek kesan ve neyê xwendin nikare rola xwe ya mirovî bi temamî bîne cih û di sînorên karekî şeklî û arşîvî de dimîne.

Zehfên xwendevanên me gazinên xwe ji me dikin, ji ber ku Welat bi rêk û pêk nagihin destê wan. Helbet ew di van gazinên xwe de mafdar in. Û ji bo ku Welat bigihe destê wan, emê hemû îmkanên xwe bi kar bînin. Lê dîsa jî pêwist e were zanîn ku derfetên me sînorkirî ne. Hêzên dewletê dest datînin ser rojnameyê ku em ji aboneyên xwe re dişînin, wekî din gelek bayiyên ku em bi îmkanên xwe Welat datînin cem wan, ji aliyê hêzên dewletê ve tên tehdîtkirin. Li hêla din DED'ê dozeke din der barê hejmara me ya 91. de vedike. Wisa xuya ye, wê ne tenê bi riyên tehdît û pesta fîzîkî, bi riya "hiqûqê" jî astengiyan ji me re derxînin.

Bi kurtî, ji bo ku Welat nikaribe jiyana xwe bidomîne û xwe bi gel bide xwendin, hêzên paşverû hemû riyan diceribînin.

Lê dema em derketin ser rê, me ev hesabên xwe jî kiribûn, me dizanibû ku astengî û kend û kosp ji pêşiya me xelas nabin.

Tevî hemû tengasî û îmkanan emê li ber xwe bidin û bi derengî be jî emê xwe bigihînin xwendevanên xwe, tenê bila xwendevanên me jî pariyekî din li zimanê xwe û rojnameya xwe xwedî derkevin.

**Têbinî:** Hefteya borî hêvoka dawîn a Nivîsara Welat ji ber çewtiyeke teknîkî nîvco mabû. Ev hevok bû, "Xwendevanên me yên ku dixwazin cildên Welat bi dest bixin, bila ji kerema xwe re li telefona 511 50 07 bigirin.

**Mazhar Günbat**


*Xwendekarên Zanistgeha Boğazîçiyê:*

# 'Emê dengê xwe bidin DEP'ê'

**Delîl Semsûrî**

Komek xwendekarên Zanistgeha Boğazîçiyê roja 23'ê Reşemiyê li ser navê "Yekîtiya Xwendekaran a Demokratîk ya Zanistgeha Boğazîçî" daxuyaniyeke ji bo raya giştî û çapemeniyê dan. Xwendekaran di daxuyaniya xwe de, xwest ku xwendekar, ji bo hevgiriya gelan ya li dijî mijokdaran, raya xwe bidin Partiya Demokrasiyê.

Di daxuyaniyê de wiha tê gotin: "Rêveberiya leşkerî tenê zilm li gelên me nekir, kesanetiya wan (serwextî, bertek nîşan dan û daxwaza guherînê ya tiştên çewt) jî, ji wan stand. Îro gelê me di nav evqas pirsgirêkên civakî, aborî û siyasî de li hemberî terora dewletê dengê xwe dernaxin, piştî hilweşîna sîstema reel–sosyalîzmê hêviya gelan ya bi pêşerojê şikest. Lê hîn mirovên ku hêviya xwe ji sosyalîzmê nebirrîne, hene. Li aliyekî ev tişt, li aliyê din teror û qetlîamên ku dewlet li serê gelê Kurd yê berxwedar pêk tîne, ji bo biratiya gelan, ji bo ku rê li ser hovîtiyan bê girtin, em wek "Yekîtiya Xwendekaran a Demokratîk" diyar dikin ku, emê raya xwe bidin Partiya Demokrasiyê. Civîn bi dirûşmeyên wek, "Bijî biratiya gelan, ji Kurdan re azadî, ji gelan re biratî, Bimire mêtingehkarî" qediya.



*Xwendekarên Zanistgeha Boğazîçiyê, piştgiriya xwe ji bo DEP'ê nîşan dan.*

# Rewşa zîndanan dîsa xera dibe

**Gurgîn Yekta**

Hewlên malbatên dîlên siyasî bêencam man. Rêveberiya Girtîgeha Elezîzê, di gel ku Musteşarê Wezîrê Edaletê sozê hevdîtina dîl û malbatan dabû, ev yek çênebû. Rêveberî hetanî 16'ê Adarê destûra hevdîtinê nade.

Malbatên dîlên siyasî, ji Elezîzê bêyî hevdîtina bi dîlên siyasî re vegeriyan. Rêveberiya Girtîgehê nehişt ku malbat xurik û vexurik jî derbasî hundir bikin.

Li ser binpêkirina mafên girtiyan, ên ji aliyê Rêveberiya Girtîgeha Elezîzê, bi dîlan dest bi greva birçîbûnê bi awayê dorvegerî kiribûn. Malbatên wan jî, ji bo başkirina rewşa wan heyetek pêk anîbûn û di 7'ê Reşemiyê de li Enqerê bi Yusuf Kenan Doğan re hevdîtinekê çêkiribûn. Jê sozê hevdîtina bi dîlan re standibûn. Li ser dayîna sozê hevdîtinê vegeriyabûn Elezîzê.

Lê li ber deriyê girtîgehê li astengên rêveberiyê qirasê bûbûn. Rêveberiya Girtîgehê, qerarê qedexebûna hevdîtinê ya bi dîlan re ta 16'ê Adarê radigihîne wan. Ji malbateke dîlan Zahru Turhalli, li ser rewşê wiha peyivî: "Em çûne cem Musteşarê Wezîrê Edaletê. Me jê re wiha got: "Ger hûn bixwazin girtiyên me bikujin, wa ye di destê we de ne bikujin. Bila dinya tev bizanibe hûn çi ne. Ger hûn bibêjin na, ew dîl in nexwe şertên dîlîtiyê bi cih bînin."

Li ser vê yekê musteşar ji me re got: "Soz, herin hûnê karibin wan bibînin. Jixwe ta niha tiştekî wilo jî çênebûye û agahiyekê bi vî awayî ji min re nehatiye."

Car din em hatin girtîgehê. Rêveberiya Girtîgehê, vêca ji binî nedihişt ku em zarokên xwe bibînin. Berê qetê nebe, rojê pênç deqîqe mafê hevdîtinê hebû, çawa em çûn cem musteşar û hatin, ji binî hevdîtin qedexe kirin.

Em nizanin gelo ev çima wisa dikin. Di destê zarokên me de, tu çek û sîleh jî tune ye. Di nava çar dîwaran de ne. Ji bo çi ji wan ditirsin?"

Wekî din li girtîgehên din jî rewş çêtir nîn e. Mînak; li Girtîgeha Çanakaleyê, bi tayînbûna Midûrê yekemîn Mustafa Hepdoğru û Midûrê duyemîn Îlhan Yavuz re, provakasyonan li ser girtiyan dixwazin pêk bînin.

Jinek bi navê xwe Zînê ku çûbû dîtina mêrê xwe yê girtî li ser rewşa wan wiha digot: "Ez heşt saetan ji bo hevdîtinê di rêzê de sekinîm, hêja destûra hevdîtinê dan. Lê tenê pênc deqîqe. Li gor ku mêrê min digot, kîloya çay û şekir bi 400 hezarî difiroşin. Bi hatina midurê nû re dayîn û standinên di navbera qawîşan de dixwazin bibirrin, ji bo vê yekê jî dest bi greva birçîbûnê kirine."

# Karmendan kolan dagirtin

**Navenda Nûçeyan–** Roja 22'yê Reşemiyê, bi pişikdariya Platforma Sendîkayên Xebatkarên Saziyên Dewletê (KÇSP), li gelek bajaran karmendan meş û xwepêşandanên girseyî pêk anîn û daxwazên xwe yên ji bo mafê grevê û peymana tomerî (Toplusözleşme) û hinek mafên din yên ekonomîk, demokratîk bi bîra rayedarên dewletê xistin. Dîsa rayedarên sendîkayên karmendan daxuyandin ku, heke heta 1'ê Adarê mafê wan neyên dayîn wê bi livbaziyên xurttir dengê xwe bilind bikin.

Ji ber livbaziya karmendan, li gelek saziyên dewletê kar sekinî. Li gorî daxuyaniya berdevkê platformê, li derên ku wan karê rêxistinê pêk anîbûn, rêjeya (nîsbet) beşdaran ji sedî 90 e. Dîsa li gorî texmînan, li Stenbolê 15 hezar, li Enqerê 5 hezar, li Îzmîrê 5 hezar û li Edeneyê 3 hezar kes beşdarî van livbaziyan bû. Ji ber sedemên ewlekariyê li Amedê livbazî çênebû.



*Bi hezaran karmend ji bo mafên xwe yên ekonomîk û demokratîk meşiyan.*

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Jiyan û mirin

Em niha di sala nû de ne, salê benê 93'an qetand, li pey xwe hişt û em derbasî nava 94'an kirin. Gelo, me kincên 93'yan li xwe şelandin? Kincên ku niha bedena me stirandine, nû ne? Ji toza kevin paqij bûne?

Bi çûyîna 93'an û hatina 94'an re, mirov "jiyan û mirinê" li pêşiya xwe dibîne. Naskirina van herdu hêzên desthilat pêwist e. Ji bo me gelê Kurdî, jiyan û mirin çi ne? Têkiliya di navbera wan de, nakokî û dubendiyên li holê, cudabûn û nêzîkbûna heyî, em çawa dikarin bibînin, binirxînin?

Di nava jiyanê de, tu dikarî mirinê jî bibînî. Wisa di nava mirinê de jî, jiyan tê dîtin. Ji nêrîneke felsefî bêhtir, em di realîteya pratîkê de lê bimeyzînin, baş dibe.

Em di navbera jiyan û mirînê de ne. Li aliyekî jiyan me ber bi aliyê xwe ve dikişîne, li aliyê din jî mirinê em xistine ablûkeyekê û her ku diçe li me teng dike. Em mirinê û jiyanê bi hev re dimeşînin. Lewma jî em li hêlekê dimirin, lê hêla din jî jiyan dibin.

***Em di navbera jiyan û mirînê de ne. Li aliyekî jiyan me ber bi aliyê xwe ve dikişîne, li aliyê din jî mirinê em xistine ablûkeyekê û her ku diçe li me teng dike. Em mirinê û jiyanê bi hev re dimeşînin. Lewma jî em li hêlekê dimirin, lê hêla din jî jiyan dibin. Qutkirina ji mirinê ne karekî hêsan e. Lewre tu ji kevin têyî qutkirin. Tu ji kevnariya dîrokê û ji gemara sedsalên derbasbûyî paqij dibî. Li vir divê mirov li ber xwe bide. Gelek caran em xwe mirî nabînin. Em mirî ne, lê hema me nav li wê mirinê kiriye "jiyan" û em devê xwe pê şîrîn dikin.***

Qutkirina ji mirinê ne karekî hêsan e. Lewre tu ji kevin têyî qutkirin. Tu ji kevnariya dîrokê û ji gemara sedsalên derbasbûyî paqij dibî. Li vir divê mirov li ber xwe bide.

Gelek caran em xwe mirî nabînin. Em mirî ne, lê hema me nav li wê mirinê kiriye "jiyan" û em devê xwe pê şîrîn dikin.

Di nava jiyana me de mirin heye. Di nava azadiya me de koletî heye. Em azadên kole ne. Em xwe serbest dibînin, lê; di serbestiyên me de bindestiyeke dijwar û giran heye.

Em cesaret nakin xwe ji mirinê cuda bikin, jiyanê jî na afirînin. Ji ber ku di mirandina mirinê de jiyan vedije. Vejandina jiyanî azadiyê bi xwe re tîne û hemû sixlet, rûmet û nirxên mirovahiyê diparêze.

Salê xwe nû kir. Gelo em hîna jî girêdayî mirinê ne? Kî dimire, kî dijî? Kî çû, kî ma? Em çawa dikarin bijîn?

Di mirina hinek însanan de jiyan heye. Ew kes piştî dimirin, jiyan dibin. Em nav li wan kesan dikin "pakrewan". Di zimanê Kurdî de gotina pakrewan tê wateya "ruhê pak, jiyana pak, canê pak..." Ango xwediyê hebûna pak. Ew kes li gorî Hezretî Zerdeşt, hêza başiyê temsîl dikin û dikarin li hemberî mirinê xwe biparêzin. Bi zimanê gel, pakrewan şehîd in. Serok Abdullah Öcalan navekî din li şehîdan dike "Jiyana rast şehîd bi xwe ne!" Bi hêsanî mirov dikare di navbera felsefeya Zerdeşt û Öcalan de, têkiliyeke tund bibîne.

Di şeva sersalê de hevalên şehîd hatine bîra min. Mirov bixwaze nexwaze bi şehîdan re jiyan û mirinê jî dibîne.

Ev sal, me bi şîn û şahiyan, bi ken û giriyan, bi meş, ketin û rabûnan qedand. Me gelek hevalên ciwan winda kirin, me gelek tacên jiyanê ji hevalên xwe re kirine diyarî.

Çûn... Di dilê me de bîranînên xwe hiştin. Tiştê ji me tê xwestin em bîranîna wan rêhevalan ji bîr nekin.

Deng, bi zengilê sersalê ket. Xelk dikeniya, pozê me jî dişewitî, em nedikeniyan, emê bi xwe bikeniyana? Çîroka gelê Kurd a jiyan û mirinê hate bîra min.

Salê xwe nû kir, jiyaneke nû bi dest xwe ve anî. Gelo emê jî xwe nû bikin?

Divê em xwe di wê salê de ji mirinê qut bikin. Di azadiya me de wê koletî tune be. Jiyana me jî, ji mirinê paqij bibe. Girîng e, em sala nû ya 94'an sala jiyanê nas bikin.

# Li Afrîkaya Başûr xwîn nasekine






*Hetanî 27'ê Avrêlê dema hilbijartinê lê tê xebitandin ku hejmara leşkerên perwerdekirî bigihîje 10 hezarî. Di hilbijartinê de îhtimala bi serketina KNA'yê zêde ye, lê hinek qebîleyên reşik û çermspiyên nîjadperest naxwazin bikevin bin desthilatiya wê.*

**Samî Berbang**

Roja 19'ê Reşemiyê 15 endamên Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê (KNA) li herêma Zuluyan hatin kuştin, rayedarên KNA'yê endamên Qebîleya Zuluyan ji ber vê yekê sûcdar kirin.

Lê Roja 20'ê Reşemiyê Serokê Partiya Azadiya Înkatayê Mangosuthu Buthelezî, ev bûyer nepejirand û kiryar protesto kir. Dîsa jî nûnerên herêmî yên KNA'yê daxuyandin ku, kesên li dijî hilbijartina Avrêlê (Nîsan) serî radikin, berpirsiyarê vê qetlîamê ne. Wek tê zanîn partiya Azadiya Înkatayê di gel çermspiyan hevkarî ava kirine û Qanûnê Bingehîn ya ku ji aliyê Mandela û De Clerk ve hatiya pejirandin, naecibînin û mafê xweseriyê dixwazin.

Hefteyek berî vê Qralê Zuluyan Zwelîthînî daxwaza keyîtiyeke serbixwe kiribû. Dîsa roja 23'ê Reşemiyê rêxistinên rastgir yên nîjadperest ji bo avakirina dewleteke (Dewleta Neteweyî ya Afrîkayê), li hinek bajarên ku ew dixwazin li ser dewletê ava bikin, bi mirovên çekdar meş û xwepêşandan pêkanîn. Li gorî nûçeyên ajansan, nîjadperestên çermspî bi konvoyeke ji 300 erebeyan pêkhatî, hatine bajarê Bloemfonteinê û di destê wan de alên Naziyan hebûye.

Li Afrîkaya Başûr piştî sala 1990'î bi serbestberdana N. Mandela hinek guherînên siyasî çêbûbû û rê li ber reforman vebûbû.

Pêşî ji bo mafê reşikan, desthilatdariyê referandomek li dar xist, di Berfanbara 93'yan de parlementoya Afrîkaya Başûr mafê wekheviyê ji bo reşikan pejirand, piştî guftûgo û lihevrûniştinên direj 20 partiyên li Afrîkaya Başûr gihiştin li hevkirineke û biryara hilbijartineke dadmend ji bo 27'ê Avrêlê hate dayîn. Niha jî Lijneya Rêveberiya Awarte (Îdareya orfî) li ser kar e. Xebata berbiçav jî, ji bo avakirina hinek saziyên rêveberiya pirrnîjadî tê kirin. Mînak leşker ji bo artêşeke nû tên perwerdekirin, heta hilbijartinê dixwazin hejmara leşkeran bigihîje 5 hezarî, piştî wê jî 10 hezarî. Tê hêvîkirin ku di vê hilbijartinê da KNA bi ser bikeve, lê hinek qebîleyên reşik û nîjadperestên çermspî naxwazin têkevin bin desthilatiya KNA'yê û doza veqetînê dikin. Her çiqas Nelson Mandela demeke berê daxuyandibû ku ew dê mafê van kesan xweseriyeke berfireh jî tê de, gelek îmkanan ji bo rêveberiya herêman pêk bînin û wê Qanûnê Bingehîn a nû vî mafî bihundirîne lê, rê li ber êrîşên van kesan nagire, gefa boykotkirina hilbijartinê dixwin. Mirovên azadîxwaz ên reşik jî rexneyên tund li polîtîkayên Mandela digirin ji ber ku ev gelek tavîzan dide nîjadperestan. Heta niha ji ber êrîşên van kesan û şerê di navbera wan û alîgirên KNA'yê de, bi hezaran mirov hatine kuştin.

## NASNAMEYA AFRÎKAYA BAŞÛR

Li ser bejahiya Afrîkaya Başûr 1.233.404 km çarkoşe û nifûsa vir digihêje 25 milyonî. Ev komar ji 4 herêman pêk hatiye. Cape, Natal, Dewleta Azad ya portekalî û Transvaalê. Lesotho jî wek welatekî serbixwe yê ji Boghuthatswana, Cîskeî, Transkeî û Vendayê pêkhatî, di nav sînorê vê komarê de dimîne.

Paytexta Rêveberiyê Pretorîa, paytexta Dadî Bloemtonteîn û ya Qanûnçêkirinê Cape Town, bajarê herî mezin Johannesburg e. Nifûs % 70 reşikê Afrîkî % 18 çermspî, % 3 Asyayî û % 9 jî çermrengîn in.

Di nav gelê Afrîkaya Başûr de, Fîle, Hîndu û Misilman hene. Zimanê fermî, Îngîlîzî û Afrîkane ye. Ev dever piştî sedsala 17'an ket bin bandora Îgîlîzan, di 1961'an de Komara serbixwe ava bû, ji 1948 vir ve siyaseta nîjadperestiyê tê meşandin. Bi şerê reşikan yê li dijî vê siyasetê, hikûmeta Afrîkaya Başûr li hemberî raya giştî ya dinê kete tengasiyê. Piştî sala 1989'an, hinek guherîn di vê siyasetê de çêbûn. Di sala 1990'î de bi berdana Serokê Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê Nelson Mandela, yê ku ji 1961'an ve di girtîgehê de bû, ev guherîn hîn bi lez û bez meşiyan. Niha ji bo Qanûneke Bingehîn ya nû lihevkirin çêbûye û biryara hilbijartineke bi beşdariya hemû nîjadan hatiye dayîn, lê gelek astengî li pêşberî vê pêvajoyê hene.

**Rewşa aborî:** "Pîşesazî ji ber madenên zêr û elmastê ku di sedsala 19'an hatine kifşkirin, bi pêş ve çûye. Ji bo derxistina van madenan keda mirovên reşik ên xîzan, tê bikaranîn. Hilberiyên wekî rîs, zad (genim, ce, nok nîsk) şekir, titûn, fêkî, pembû, hilberiyên şîr, masî hene.

Pişesazî ji aliyê makîne, çêkirina erebeyan, kimyayê, zibilê kimyayî, tekstîl, cil, elektronîk û computerê ve bi pêş ve çûye.

Li aliyê din hînarde (îhracat) ya Afrîkaya Başûr zêdetirî % 50 li ser zêr e. Xeynî zêr, elmast, uranyum jî tê derxistin. Bi hilanîna amborga navneteweyî, rê li ber pêşveçûyinê vedibe.

# Li Meksîkayê lihevrûniştina aştiyê

Lihevrûniştina aştiyê ya di navbera hikûmeta Meksîka û ELZN'ê de roja 21'ê Reşemiyê, li bajarekî nêzî sînorê Guatemalayê cihê ku, serhildanê lê dest pê kiribû, di katedraleke de dest pê kir.

Serhildêran daxuyand ku, heta daxwazên wan ên di warê xanî, erd, xwarin, xizmetên tenduristiyê û perwerdehiyê de neyên cih, wê çekê xwe daneynin. Êndamên Lijneya ELZN'ê bi çek û maske hatin cihê hevdîtinê.

Berdevkê serhildêran Komandan Markos, di hevpeyvîneke xwe de ya ku bi hinek rojnameyên biyanî re bû, hinek daxwazên xwe wiha rêz kirin: "Xweseriya xwecihên Çîapanê, îstîfakirina Serokê Meksîkayê Salînas û avakirina hikûmeteke awarte, heta hilbijartina Gelawej (Tebax)'ê ya ji bo hilbijartina serokkomar".



Wî dîsa derbir ku, ew ne li benda lihevkireneke di demeke kurt de ne. Serokê Lijneya Aştiyê ya Hikûmeta Meksîkayê Manuel Edmacho, got ku daxwazên ELZN'ê yên der heqê guherînên polîtîkî de neyên guftûgokirin. Lê dîsa got ku wê ew bala xwe bide hemû pêşniyaran.

# Fîlmê Îrlandî xelata zêrîn stand

Di Festîvala Fîlman a Berlînê de, xelata herî bilind, "Hirçê Zêrîn" fîlmê Îrlandî yê bi navê "Li Ser Navê Bavê" (In The name of The Father) stand. Ev xelat, roja 21'ê Reşemiyê hate dayîn. Mijara fîlm ji romana Gerard Conlon, hîpiyekî Belfastê ya bi navê "Bêtawaniya Îspatkirî" hatiye standin. Roman der heqê çar kesên ku ji ber bombekirina du kafeyan di 1975'an de hatin tawanbarankirin û ji ber qanûnê terorê ceza xwarin, piştî 15 salan bêtawaniya wan îspat bû û hatin berdan, hatiye nivîsîn. Gerard ji yek ji van kesan bû.

Fîlm bi vî awayî rexneyê li sîstema dadî ya Îngilîzan digire. Derhênerê fîlmê Jîm Sheridan e û serlîstikvan jî Danîel Day–Lewîsj e.

Fîlm ji aliyê hinek rojnameyên Îngilîz ve bi piştgiriya ÎRA'yê tê rexnekirin. Ew çar kes ji ber livbaziya ÎRA'yê hatibûn darizandin. Vî fîlmî di nav 22 fîlman de xelata herî mezin girt, di Festîvala Fîlman ya Berlînê a 44'an de.

Hirçê Zêrîn bû para 6 fîlman; fîlma Phîladelphîa ji bo lîstika serlîstikvan Tom Hanks, fîlmê "Cadybird, Ladybird" ji ber serlîstikvana jin (aktirîst) Crîssya Rock, fîlmên Fransiz, "Smdein" û "Nosmoking" ji ber derhêner Alaîn Resnaîs û fîlmê Kuba "Fresay Chocolatc".

# 'Rûsya alîkariya Gurciyan dike'

Li gorî nûçeyeke Ajansa Reuter'ê ku roja 22'ê Reşemiyê belav kir, Serokê Meclîsa Abhazyayê Vladîslav Arzînba, der heqê peymana ku di navbera Gurcîstanê û Rusyayê ya ku roja 3'yê Reşemiyê de hatibû morkirin, daxuyaniyek kir. Arzînba wiha got: "Helwesta Rusyayê di vê meselê de tim bi du alîtî bûye, rê li ber dagirkeriya Gurcîstanê dihate girtin, heke Rusyayê gelek çek nedana wan, niha dîsa rewşeke bi vî rengî derdikeve pêşberî me. Piştî xwe ji nû ve ava bike, bi vî awayî jî rê li ber împeryalîstiya rayedarên Gurciyan nayê girtin."

Arzînba ew daxuyanî berî pêkhatinan lihevrûnîştina Lijneya Gurcî û Abhazan, ku bi navberîtiya NY'ê çêdibe kir û hinek rexne li NY'ê jî girtin.



## *Mehmet Gölhan qaçaxên leşkeriyê tehdît kirin*

Wezîrê Parastinê Mehmet Gölhan, li ser pirsgirêka leşkerên qaçax û cezayên ku wê li wan qaçaxa bê birrîn, agahî dan. Li gorî Gölhan, kesên ku mane bakayayê û yên wextê xwe bihurandine, heta 19'ê Gulanê ew xwe teslîm nekin wê der heqê wan de doz bê vekirin. Li gor gotina wezîr li Tirkiyeyê 225 hezar kes qaçaxê leşkeriyê ye. Wezîr Gölhan, piştî qanûnê ku di Meclîsa Neteweyî ya mezin de, di 16'ê Reşemiyê de hate pejirandin û di 18'ê Reşemiyê de di Rojnameya Resmî de hate weşandin, civîneke çapemeniyê çêkir. Di civînê de Gölhan diyar kir ku, cezayê hatiye pejirandin ji bo 6 mehan heta 2 salan e, lê Gölhan dibêje: "Ev ceza ji ber ku dikare bibe cezayê pereyan û roja cezayê jî 5 hezar 12.ye, ev yek çavê mirovan natirsîne." Wezîrê Parastinê Mehmet Gölhan, li ser kesên ku di zanîngeha Vekirî (Açik Öğretîm Fakultesî) de dixwînin jî wiha got: "Qanûnê nû jî û yê berê jî der heqê vê yekê de eynî tiştî dibêjin; kesên ku 2 salan li ser hev di poleya xwe de bimînе, li gorî qanûnê qaçaxên din ku xwe teslîm bikin, meseleyek namîne."

# DEP ji hilbijartinê vedikişe

■ *Partiya Demokrasiyê piştî civîn û liheyrûniştinan, biryarê vekişîna ji hilbijartinê da. Qerar bi raya gelek endamên Meclîsa Partiyê hate dayîn. Sebebê vekişîna ji hilbijartina 27'ê Adarê jî bi "nemanbûna meşrûiyeta hilbijartinê" ve hate girêdan û tê daxuyandin ku ji bilî vê biryarê jî tu riya ku tê de herin, nemaye.*

**Navenda Nûçeyan–** Ji civînên Partiya Demokrasiyê biryara vekişînê derket. DEP, ji bo ku rewşa xwe ya dawî hilde dest û biryara beşdarbûn û nebûna hilbijartinê diyar bike, ji 23'ê mehê heta 25'ê mehê ta êvarê, civîn pêk anîn. Piştî ku di Civîna Şêwiriya Firehkirî ya 2. de, meyla "vekişîna ji hilbijartinê" derketibû, Meclîsa Partiyê jî, ji bo ku li ser vê yekê bişêwire û biryarekê bistîne, li hev civiyan. Meclîsa Partiyê bi nivîskî daxuyand ku, biryara vekişîna ji hilbijartinê, standine.

Serokê Giştî yê Partiya Demokrasiyê Hatîp Dîcle, di dema diyarkirina qerarê ku ji aliyê Meclîsa Partiyê ve hatiye standin de, daxuyand ku, tu meşrûbûna hilbijartinê nemaye. Dîcle got ku ji gava diyarbûna dema hilbijartinê ve tehde, pêkutî û êrîş li ser wan pêk hatine û guherînên ku di qanûnê hilbijartinê de hatine kirin jî bi mebesta fetisandina DEP'ê ne.

Partiya Demokrasiyê biryara vekişîna ji hilbijartina 27'ê Adarê, bi daxuyaniyeke nivîskî, bi navê "ji raya giştî re" diyar kir. Di vê daxuyaniyê de sebebên vekişînê tên rêzkirin. Di daxuyaniyê de tê derbirîn ku ji çar salan bi vir 70 şehîd dane tevî yên HEP'ê û di nav 45 rojên dawî de jî, ji wan 7 kes hatine kuştin, rêxistinên 6 navçe û bajêran hatine bombekirin, Sekreterê wan î Giştî di mala xwe de ji aliyê êrîşkaran ve hatiye birîndarkirin, navenda wan hatiye bombekirin, di vê bûyerê de yek hatiye kuştin û 17 kes jî birîndar bûne.

Bi berdewamî tê daxuyandin ku, pêkutî li berendamên wan hatiye kirin ji bo ku ji berendamîtiyê vekişin û dîsa 320 kes ji wan hatine binçavîkirin. Li ser guherînên di qanûnê hilbijartinê de jî tê gotin ku bi mebesta fetisandina DEP'ê hatine çêkirin û ne guherînên demokratîk in.

Di dawiyê de tê diyarkirin, ku di bin siya polîs, cerdevan, tîmên taybetî û qanûnên taybet de nikarin beşdarî hilbijartinê bibin. Daxuyanî wiha diqede: "Me qerar da ku, em nikarin di binê ablûkaya qanûnên taybet, pesta cerdevan, polîs û tîmên taybetî de, bikevine hilbijartina 27'ê Adara 1994'an, ku dixwazin îradeya gelê me ji navê hilînin û me bikine alet ji kirinên xwe re û ev biryara vekişînê, bi qerarê pirraniya dengan hatiye standin."



*DEP'ê hemû berendamên xwe yên belediyeya kifş kiribûn, lê dîsa jî ji bo hilbijartinê rewş berbihev nedîtin.*



## *Catherîne Lalumîere:*

# 'Ji meseleya Kurd re çareya siyasî pêwist e'

**Navenda Nûçeyan–** Sekretera Giştî ya Konseya Ewrûpayê Catherîne Lalumîere, Tirkiyeyê ziyaret kir. Lalumîere Serokkomar Süleyman Demirel jî tê de, bi gelek rayedarên hikûmetê, partî û rêxistinên demokratîk re hevdîtin pêk anîn.

Catherîne Lalumîere, bi daxuyaniyên xwe, yên bi Özgür Gündemê re, diyar kir ku şîdet bi xwe re şîdetê tîne û dibêje ku, ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdî, pêdivî ji bilî têkoşîna çekdarî bi muzakereyên ji bo çareya siyasî heye. Sekretera Giştî ya Konseya Ewrûpayê di hevpeyvîna xwe de derbiriya ku, parlementerê Partiya Demokrasiyê ji aliyê parlementerên Tirk ve wek pêgirê PKK'ê ji wê re hatine gilîkirin. Catherîne Lalumîere her wiha dide xuyan, ku bi rayedarên Tirk re li ser hilbijartinên meha Adarê jî peyiviye û ev mijar hatiye rojeva wan.

Lalumîere li ser problema Kurdî wiha dibêje: "Ez bawer dikim ku, pêdivî bi dîtina çareyeke ku em bi hev re lê bigerin heye. Dema em li dîrokê binihêrin, wê bê dîtin ku gelşên bi vî cureyî bi çekê nehatine helkirin. Di vê mijarê de tiştê ku, diyar e, ev e: Şîdet tenê bi xwe re şîdetê tîne."

## *Kontrayan du bira kuştin*

**Navenda Nûçeyan–** Li Amedê elemanên kontrgerîla 2 birayên welatparêz, li Taxa Bağlarê kuştin. Di êrîşê de herdu birayên ku hatin kuştin endamên DEP'ê bûn û bavê wan Mehmet Tekeş jî berendamê DEP'ê yê navçeya Bağlarê ye. Li gorî kesên ku êrîş dîtibûn, 3 elemanên kontrgerîla ku temenê wan di navbera 18 û 20 salan de bûn, ev êrîş pêk anîn. Navê herdû birayên welatparêz ev in: Soner Tekeş (20) û Ahmet Tekeş (28).

# Di DEP'ê de du sîmayên rengîn

**Yilmaz Erdoğan** *(Berendamê DEP'a Üsküdarê)*

*Hûn dikarin sedemê beşdarbûna xwe ya DEP'ê ji me re bibêjin?*

– Niha em ji ku dest pê bikin. Ji bo beşdarbûna DEP'ê wisa sedem hene ku, carina ez ji xwe aciz dibim û dibêjim çima heta niha ne li vir bûm. Partiya Demokrasiyê wada wê ya yekemîn demokrasî ye. Jixwe, di nava demokrasiyê de jî her tişt heye.

*Li Üsküdarê di hilbijartina 27'ê Adarê de şansê serkeftina DEP'ê çiqas e?*

– Bi rastî, emê bi rastiyên xwe partiyên din ji Üsküdarê biavêjin. Emê ji wan re bibêjin bes e!... Bes e êdî xwînmijiya we!... Dibe ku hûn bibêjin tu gotinên zehf mezin dikî, lê ji niha ve ez bi çavê serkeftinê li vir dinihêrim.

*Di dema HEP û ÖZDEP'ê de ji aliyên rayan ve rewşa wan ne zehf baş bû, li gor we çi guherî, ku hûn bi çavên serkeftinê li Üsküdarê dinihêrin?*

– Êdî gel bi ser xwe ve tê. Baweriya wî bi partiyên burjûvayî nemaye. Niha DYP, ANAP, SHP û partiyên din anketan çêdikin û qet jî şans nadin DEP'ê.

**YILMAZ ERDOĞAN (Berendamê DEP'ê yê Serokatiya Belediyeya Üsküdarê)**



Êdî gel bi ser xwe ve tê. Baweriya wî bi partiyên burjûva nemaye. Niha DYP, ANAP, SHP û partiyên din anketan çêdikin û qet jî şens nadin DEP'ê. Ger mêr bin bila werin Üsküdarê, bila bi çavên xwe bibînin, ka gel ji aliyê kê ye. Lê ditirsin newêrin werin vê derê. Di dema HEP û ÖZDEP'ê de gel ji wan ditirsiya newêribû nêzîkayî li wan bike. Vêga gel bi rastiyê hesiyaye û êdî diqîre: "Yên ku me ji vê pîsîtahiyê xelas bike dîsa DEP e."

Ger mêr bin bila werin Üsküdarê, bila bi çavên xwe bibînin, ka gel ji aliyê kê ye. Lê ditirsin newêrin werin vê derê. Di dema HEP û ÖZDEP'ê de gel ji wan ditirsiya, newêrîbû nêzîkayî li wan bike. Vêga gel bi rastiyê hesiyaye û êdî diqîre: "Ji DEP'ê zerar nagihîje me. Yên ku me ji vê pîsîtahiyê xelas bike dîsa DEP e."

*Ji bo Üsküdarê projeyên we çi ne?*

– Ji bo Üsküdarê zanîngehek pêwist e. Emê wê çêbikin. Li her taxê emê nexweşxaneyekê çêbikin. Û yên ku rewşa wan a aborî ne baş be, ji kîsê belediyeyê wê li wan bê nêrtin. Emê ji binî ve nehêlin ku yek erebeyek li meydana Üsküdarê bisekine. Û yek otobus û mînîbusek jî wê li vir nesekine. Di şûna wan de emê taksiyên ku deh kesan hildigirin bînin, ji bo rehetiya gel. Dîsa emê tramvayeke modern, ji bo gelê Üsküdarê, ku di navbera sê çar navçeyan de xizmet bike bînin. Li taxên ku ji wan re dibêjin "gecekondu" ji bo zarokên wan dibistan, parkên zarokan û ji tevî jî giringtir lokalên çandî (ji bo zarokan ku bi awayekî zanistî xwe nas bikin), vekin. Arazîyên xezînê ku niha di destê xwînxwarên zengîn de ne, li gel belav bikin. Dibe ku hûn vê pirsê bipirsin, "Hûnê çawa pêk bînin ew çend karan?" Ji bo vê yekê emê pêdivî û alîkariyê bixwazin. Min wad daye, ezê Üsküdarê wisa bikim ku ne tenê di nava Tirkiyeyê de, lê di nava dinyayê de jî bibe navçeyeke mînak û herkes vê derê wê mînak nîşan bide.

*Li ser van bûyerên dawî ku li DEP'ê qewimîn hûnê çi bibêjin?*

– Dewlet bi van bûyeran dixwaze ku, em beşdarî hilbijartinê bibin. Bala xwe bidinê ez nabêjim dewlet dixwaze em beşdar nebin. Dixwaze em beşdar bibin. Yanî Endamê me dikuje, berendamên me dixe bin çav, buroyên me bombe dike, dixwaze me tahrîk bike. Çawa ku bibêje. "Va ye ez we dikujim hûn jî hêrs bibin û beşdarî hilbijartinê bibin".

Bifikirin li Kurdistanê li ser sandoqan wê kontra û cerdevan bisekinin, çi malûm e ku wê rayên gel neguherînin, li ku hilbijartin çêbibe li rojava emê dersekê baş bidin wan. Wahşetên ku li Kurdistanê dikin nikarin li vir bikin. Yek rayeke me jî bi hîletî bibin, emê dinyayê li serê wan xera bikin.

*Tiştekî ku me nepirsî û hûn bixwazin bibêjin heye?*

– Dixwazim bi saya we mesajekê li gelê Üsküdarê bikim. Êdî bi partiyên din neyên xapandin, em di nava demokrasiyê de bi biratî, ji bo rojên xweş bi hev re bin, alîgirê hev bin û bi ser kevin.

## Li ser pirrdengî û pirrengiya DEP'ê du hevpeyvîn

DEP, berê bi pirranî ji ber yekdengbûn û yekrengbûna xwe dihate rexnekirin. Pirr kesên sosyalîst, demokrat, Tirk an jî Laz digotin DEP rêxistineke neteweperestên Kurd e û ji pirrdengiyê jî ditirse. Ji ber vê taybetiya wê ya nebaş wê naecibînin. Ev rexneyên ku li DEP'ê û berê jî li HEP'ê dihatin girtin, çiqas rast an jî çewt bûn, em naxwazin li vir wan binirxînin. Tiştê êdî zehf me eleqedar dike û di rojeva me de ye rewşa DEP'a îro ye. Dema em li DEP'a ku amadekariya hilbijartina 27'ê Adarê dike, dinêrin, taybetiya wê ya ku zêdetir bala me dikişîne ser xwe pirrdengî û pirrengiya wê ye. Di Partiya Demokrasî ya îro de her cure sîmayên rengîn û dengên cihê di mewkiyên wê yên xwedî gotin de cih girtine. Ji Lazan bigirin ta Çerkez û Abhazayan, ji sosyal demokrat û gundiyan bigirin ta sosyalîst, komunîst û dîndaran, di nav DEP'ê de ne û lê xwedî derdikevin. Ne tenê endam an jî hilbijêrên DEP'ê her wiha rayedar û berendamên wê jî, ji dever û derdorên cihê ne. Bi kurtî, êdî tu kes nikare îdîa bike ku DEP tenê Partiya Kurdan e û neteweperest e.

Ji bo ku em vê pirralîbûna DEP'ê bidin xuyakirin em vê hefteyê bi du berendamên wê yên cihêreng; yek jê Laz, yê din ji SHP'ê veqetiyayî re du kurtehevpeyvînan pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

**Alî Riza Dîzdar** *(Berendamê DEP'ê yê Kaxitxaneyê)*

*Birêz Alî Dîzdar, hûn ji SHP'ê veqetiyan û beşdarî DEP'ê bûn. Sedemê vê yekê çi bû?*

– Berê ez di SHP'ê de bûm. Lewre me dixwest hin guherînan di nava wê partiyê de çêbikin. Mînak ez endamên KHH'yê (Komeleya Hiqûqnasê Hemdem) bûm. Min dixwest ku navê îşkenceyan nebihîzim, li kesî îşkence neyê kirin, bi taybetî jî li gelê Kurd.

*Hûn bi ser ketin?*

– Na, ji ber wê yekê ez veqetiyam. Têkiliyên min di nav SHP'ê de zehf baş bûn. Ji serokê wê bigirin ta Hîkmet Çetîn, Salîh Sümer û yên din. Wexta ku peywir li me belav kirin, min ji Hîkmet Çetîn re hem bi devkî û hem jî bi nivîskî got: "Der heqê Kurd û Kurdistanê de hûn çi bidin min, ez amade me." Lê mixabin Kurd Hîkmet, karekî wiha neda min.

*Çima ne partiyeke din, lê DEP?*

– Mirovê ku ji xwe re dibêje, ez demokrat im, ez pêşverû me, ez sosyalîst im, pêwist e îro di nava DEP'ê de cihê xwe yê bi rûmet bigire. Min jî, ji xwe re digot: ez demokrat im, ez sosyalîst im, ê nexwe gerek ez bihatama

**ALÎ RIZA DÎZDAR (Berendamê DEP'ê yê Serokatiya Belediyeya Kağitxaneyê)**



Mirovê ku ji xwe re dibêje: "Ez demokrat im, ez pêşverû me, ez sosyalîst im, pêwist e îro di nava DEP'ê de cihê xwe yê bi rûmet bigire. Min jî, ji xwe re digot; ez demokrat im, ez sosyalîst im, ê nexwe gerek ez bihatama DEP'ê û ez hatim. Hevalên DEP'ê ji bo berendamiya serokatiya belediyeyê teklîf li min kirin, ku bigotina "Alî Riza were bibe dergevanê me ezê dîsa bihatama DEP'ê."

DEP'ê û ez hatim. Hevalên DEP'ê ji bo berendamiya serokatiya belediyeyê teklîf li min kirin, ku bigotina "Alî Riza were bibe dergevanê me ezê dîsa bihatama DEP'ê."

*Li gor we pêdiviyên navçeya Kağitxaneyê çi ne?*

– Wada min ya yekemîn ew e ku, karkerên ji aliyê "Adîl Düzenê" (Sazûmana Adîl) ve ji kar hatine avêtin, car din wan têxim kar. Pêdiviyên Kağitxaneyê pirr in, wek Halk Evleri (Malên Gel) ji bo pêşketina gel. Dîsa ji bo tendurîstî (sihetiyê) ya gel, li çar taxan vekirina nexweşxaneyan û ji aliyê belediyeyê ve bi hêsanî li gel bê nihêrîn. Wekî din lîstikgeha gogê ji bo xortan. Tê bîra min ez 10 salî bûm, min di lîstikgeha ku niha heye de, bi gogê dileyist, niha 40 sal derbas bû, hê jî wek xwe ye û wê ew lîstigeh tenê ne ji bo gogê be jî, wê ji bo civînan be jî. Roja ku ji bo belediyeyê biryar bê standin, bi gel ve emê li wir bicivin û biryara xwe bi gel re bidin.

*DEP'ê di nav gelê Kurd de şax daye. Ji bo ku di nava gelê Tirk de jî belav bibe, divê çi bê kirin?*

– Bi dîtina min DEP tenê ne partiya Kurdan e. Lê ku Kurd lê xwedî derketibin qenc û xweş kirine. Lewre DEP partiyeke pêşverû ye, mirovên ku tên DEP'ê jî mirovên pêşverû ne. Nexwe Kurd pêşverû ne. Yên ku Tirk û demokrat in jî emê bi kirinên xwe, bi xebatên xwe wan bikişînin nav refên xwe, ger em wiha bikin, karin wan jî bikin demokrat. Jixwe yên ku ji xwe re dibêjin demokrat û pêşverû, dibe bila Kurd, dibe bila Tirk be, ji bo îro divê alîgirê DEP'ê be. Nexwe ne demokrat e.

*Li ser van bûyerên dawî hûn çi difikirin? Yanî ta navenda DEP'ê jî hate bombekirin û însan mirin.*

– Gotineke misilmanan heye ku tim Partiya Refahê dibêje: "Wek tê sibehê bimirî îbadet bike û wek ku qet mirin tune be jî bixebite."

Komara Tirk ji ber tengasiya sîstemê wisa lê hatiye ku, partiyeke siyasî nikare siyaseteke rast bike, nikare behsa demokrasiyê bike. Partî bi navê xwe Partiya Demokrasiyê ye. Lê dewlet nahêle ku demokrasiyê bi gel bide nasîn. Ji ber ku partiya me jî vê qebûl nake, bi dehan endam û rêvebirên wê, ji aliyê kesên diyar ve hatine qetilkirin. Buroyê wê hatine texrîbkirin, ta navenda partiyê jî hatiye bombekirin.

*Bi dîtina we, wê DEP têkeve hilbijartinê?*

– Vê yekê wê serokatiya DEP'ê kifş bike. Ez ne mafdar im. Lê dîtina min a şexsî ez dibêjim, "Mirin ji ku û bi çi awayî tê, li ser çav û seran." Lê ev dîtina min a şexsî ye.

*Hûn hilbijartinê çêtir dibînin ne wisa?*

– Ez dudilî me. Bi rastî hê jî min xwe safî nekiriye. Ji aliyekî ve ez dibêjim ji bo gel gerek e em beşdarî hilbijartinê bibin. Lê li aliyê din faşîzma Komara Tirk tê bîra mirov, ku gund û bajarên Kurdistanê, wan însanê bêsûc dikuje. Yanî ez hê safî nebûme...

***Hevpeyvîn: Qenco Rojava***

## Neqtik


*Birabin xayetan yek bê biray xaye yek bûne*
*Ewî komek be fikrt bê le her labê bratane*
***Helbestvanê Kurd Qanî***

## KÊ ÇI PEKAND?

**Demokrasî li Tirkiyeyê çik li piya ye!**

*Serokkomarê Tirkiyeyê*
*Süleyman Demîrel*

# Mala dewletê ava be cihê şûjina min çêkiriye



Berî 12'ê Rezberê (Îlon) çi rêxistinên Kurdan hebûn, diçûn nava gel û propaganda xwe dikirin. Naveroka vê propagandayê ev bû: Dîroka Kurdistanê (bi taybetî PKK'ê fêrî gel dikir), zilm û zora dewleta Tirk, tehdeya leşkeriyê, welatekî serbixwe, civakeke azad û hwd...

Di vê pêvajoyê de gund dihatin parkirin ji alî rêxistinan ve. Weke gundên Apociyan, yên KUK'ê, DDK'ê (xelkê di wê demê de nedigot DDKD).

Rojekê çend heb endamên Apociyan (gel di wê demê de digot Apocî) diçin gundekî Dêrik a Çiyayê Mazî. Navê gund Heboşî ye. Ev kes propaganda xwe dikin û qal û bala wan zilm, zor û tehdeya dewleta Tirk e. Ji Heboşiyê Xaltîka Emşê jî, ji niha û pê ve ew jî Apocî ye.

Salek di pey re, sixurma derbeya leşkerî çêdibe, di 12'ê Rezberê de. Di vê gavê de şoreşger têne girtin an jî derdikevin derve.

Pirr hindik saleke din elektrîk tê Heboşiyê, gundê Xaltîka Emşê.

Xaltîka Emşê di emrê xwe de ampûl, prîz û hwd nedîtiye. Dibîne ku ampûl roniya wê zehf e. Bi vê gelekî kêfxweş dibe. Di vê kêlîkê de tiştên ku Apociyan jê re gotibû ji bîr dike. Xaltîka Emşê ji herdu qulikê prîz re dibêje qey cihê şûjinê ye. Hema dibêje: "Ka Apociya digot dewlet pîs e, va ye cihê şûjina min çêkiriye." Gava ku şûjinê dixe prîz, cereyan wê digire û ser piştê li erdê dikeve. Zarokên wê bi vî halê wê dikenin û dibêjin:

"Yadê, tiştên ku Apociyan digot rast bû, va ye dewletê bi prîza xwe jî tu xist erdê."

***Ferec Kurêşivan***

## Jûjî... Doğan Güzel




# Rêxistina dînan: DDDD

Berî 12'ê Rezberê li Kurdistanê herkes girîng bû ku di rêxistinekê de cih bigirta. Dînên Kurdan, neketibû rêxistinan, ew rêxistina xwe ava kirin. Navê rêxistina wan DDDD bû. Ango "Doğu Devrîmcî Delîler Derneğî (Komeleya Dînan a Şoreşgerên Rojhilatê)" Di sala 1978'an de belavokek wan kete nava gel. Serokê DDDD'ê, ji Qoserê (Mêrdîn) Mehmet Tewfîk Eser bû. Navê bavê wî Eta ye, herkes dinase.

Di belavoka xwe de, Eta bang li dînên Kurdistanê dike ji bona yekîtiyê. Di dawiya belavoka xwe de dibêje, Atatürk wiha dibêje: "Hayatta en hakîkî mürşît îlîmdîr" (Di jiyanê de rêberê heqîqî ilm e). Di pey re jî dibêje, M. Tewfîk Eser jî wisa dibêje: "Hayatta en hakîkî mürşît îlîm, sabir ve cesarettîr" (Di jiyanê de rêberê heqîqî ilm, sebir û cesaret e). Bi vê gotina xwe rêxistinên Kurdan rexne dike.

Dibêje KUK bi sebir û bi cesaret e, lê ne xwedî ilm e, ji ber ku xwe dispêre feodalan. DDKD bi sebire, zana ye, lê ne cesûr e. Apocî zana ne cesûr in, lê bêsebir in. Ji ber vê yekê em neketin nava tu rêxistinê, me rêxistina xwe ava kir. Bi navê DDDD'ê.

***Ferec Kurêşivan***

# Torî û dimsê herikî

Du kes ji gund diçin bajêr (Misircê) ji bo dimsê xwe bifiroşin. Gava ev herdu gundî digihîjin çiyayê Mawa, yek ji yê din re dibêje:

– Yabo qurbano, tu wan kevirên (taht) spî dibînî, niha ew tev bibûna mihên min. Yên din bersivê bi vî awayî didê:

– Yabo qurbano tu ji wan kevirên reş dibînî, ew jî gurên min bûna min berda ser mihên te. Wê mihên te tev bixwarana.

Yê din hema bersivê dide:

– Pehek, yabo min di qahfê bavê te niyayo, çawa gurên te wê mihên min bixwin. Piştî vê xeberê herdu li hev dixin, qrên dikin. Yekî Torî jî barê wî dims e. Ji wan re dibêje:

– Çilo çêbûye, hûn çima li hev dixin?

– Yabo qurbano tu viya nabînî; ez dibêjim ew kevirên spî ên serê çiyê bibin mihên min, wê çiqas baş be. Viya jî dibêje: Ew kevirên reş jî bibin gur û mihên te bixwin.

Ê Torî dibêje:

– Derdê we ev e. Îcar li min mêze bikin:

Torî radibe hebana (meşka) dimsê xwe vedike û berî ser tahtê dide. Germa Gelawêj (Tebaxê) li dims dixe û dims diherike. Torî dibêje:

– Ez wek vê dimsê biherikim ku hûn herdu jî bêaqil in.

# Li Qudusê Navenda Çanda Kurdî

**Qudus, Welat–** Li Qudusê Civata Dostanî ya Îsraîlî û Kurdî û Navenda Çandî ya Kurdî ava bû.

Di dawiya sala 1993'yan de Civata Dostanî ya Îsraîlî û Kurdî û Navenda Çandî ya Kurdî ji bo bersivandina pêdiviyeke ku ji mêj ve xwe dide hîskirin, ji bo koordînekirina xebatên Çanda Kurdî û çalakiyên akademîk li Îsraîlê, hate avakirin.

### CIVATA KU TÊ HEDEFKIRIN

Qudus xwediyê civateke Kurdên Cihû ku hejmara wan digihêje 100 hezarî ye û bi vê taybetiya xwe jî xwediyê civata herî mezin ya Kurdistanî ye, li Îsraîlê.

Gelek endamên vê civatê îda dikin ku, divê piştî festîvala Kurdên Cihû (Sahraneh'ê,) hinek çalakiyên çandî çêbin. Ev festîval her çiqas li Kurdistanê dema biharê çêdibû jî, li Îsraîlê di demsala payîzê de tê li dar xistin. Navenda Çandî ya Kurdî ji ber ku çalakiyên çandî folklorî û akademîk pêk bîne û her wiha rê li ber lêkolîn û weşanên xwedî rist û şîdandî yên der heqê van lêkolînan de veke, hatiye avakirin.

### ARMANCÊN RÊXISTIN Û NAVENDÊ

1– Ji bo bi pêşvebirina pêwendiyên dostanî û têkiliyên akademîk û çandî, hem di navbera Îsraîlî û Kurdên Cihû de, hem jî di navbera Îsraîlî û Kurdên ji baweriyên din (Sunnî, Elewî, Yezîdî û hwd.) her wiha, di navbera rêxistinên Îsraîlî (Cihû) û rêxistinên Kurdî yên li ser rûye zemîn de.

2– Avakirin û liserpiyahiştina Navenda Çandî ya Kurdî

3– Serkêşiya projeyên lêkolînê yên der barê çand, dîrok, ziman û folklora Kurdistanî û Kurdên Cihû de, bi riya li darxistana konferansan, avakirana rêxistinên lêkolînê û bihevguherîna pirtûk, kovar û gotaran.

4– Navenda Çandî ya Kurdî wê li Qudusê wek forume kar bike, ji bo bi hevguherîna xebatên çandî, akademîk, di navbera Kurd û Cihûyan, her wiha di navbera Kurdolog û xwendekarên Kurdolojiyê de, hem li Îsraîlê, hem ji li derve.

Dîsa wê rêxistin û navend ji bo çapkirina weşanan, pêkanîna civînên akademîk, zanistî, çandî, folklorî û civakî jî wek forumekê kar bike.

### ÇALAKIYÊN 1994'AN

1– Projeya dîroka devkî, ji kal û pîrên Kurdên Cihû ku niha li Qudusê ne. Pirr mixabin ku, di vî warî bijûn de heta niha kêm tişt hatine kirin, ji bo bi belgekirina dîroka Kurdên Cihû, bi taybetî jî kes û civatên Cihûyên Kurdistanê. Li ser vê mijarê berfireh û niha ji lêhûrbûnê bêpar, heta niha pirr hindik tişt hatiye kirin. Dendikê vê projeyê wê jî pêdaketinên Xwedankarên Zanistgeha Hebrewê yê ji beşên civaknasî, dîrok û antropolojiyê pêk were. Ev kes wê bi kal û pîrên Kurdên Cihû re, der barê jiyana wan, ya li Kurdistanê de hevpeyvînan pêk bînin û serpêhatiyên wan ber hev bikin.

2– Navendeke hindekareyê ji bo xebatên li ser dîroka Kurdî, li ber avabûnê ye. Divê bê gotin ku, têkiliyên di navbera Cihû û misilmanên Kurdistanî de, pirr bi dostanî derbas bûye, ji vê yekê ye ku, hikûmeta Îsraîlê di salên 1960 û 1970'yan de pitşgiriya şerê Kurdên Iraqê, yê li dijî rejîma Iraqê kir. Di gel vê yekê li berjewediyên hikûmeta Îsraîlê tê, ku wek dewleteke ji aliyê Erebên misilman ve hatiye dorpêçkirin, bi Kurdên ku ne Erebên misilman in û bi sedsalan ji destê Tirk, Ereb û Farisan kişandine re, pêwendiyên dostanî deyne.

Navenda hîndekariyê ya ku tê avakirin, wê pirtûk, kovaran û nivîsên ji rojnameyan hatine birrîn, yên der mafê Kurdên Cihû, yên li Îsraîlê û Kurdên li hundir (Kurdistanê) û derve de, berhev bike û veşêre. Ev der wê wek navendeke ji bo lêkolîna li ser dîrok û çanda Kurdî kar bike.

3– Navenda çandî ji bo weşandina pirtûk, kovarên bi qelîte û gotarên ku li hemû aliyên Çanda Kurdistanî hûr dibin, wê wek forumekê bixebite.

Navend û civat wê komcivîn û civînên bi mebesta pêk anîna têkiliyên dostanî di navbera Îsraîl û Kurdên ji hemû baweriyan (hem li Îsraîlê hem li derve), li dar bixe.

4– Rojên çanda Kurdî wê bê li dar xistin. Di van rojan de wê fîlmên Kurdî bên nîşandan, dersên ji dîrokzan, civaknas û folklorîstan bên pêşkêşkirin û çîrokên ji devê çîrokbêjên otantîk (bi taybetî yên li Kurdistanê) wê bên vegotin.

5– Navend wê di warê muzîk û dans (govend) a Kurdî de jî rista forumekê hilde ser milên xwe. Di bin serokatiya pisporan de, wê kursên dansa Kurdî, kursa strîn û lêdana ambûrên kevneşopî, pêşkêşî ciwanan bibin.

*Seroka Weqfa Azadiyan a Fransayê Danîelle Mîtterrand:*

# 'Alîkariya mirovî ji siyasetê nayê qetandin'



Danîelle Mîtterrand

Seroka Weqfa Azadiyan a Fransayê û pîreka Serokkomarê Fransayê Danîelle Mîtterrand, ji Özgür Gündemê re, li ser xalên ku dihatin meraqkirin axivî, nêrîn û hizrên xwe derbirîn û rexne li çapemeniya Tirk kir, ku gotinên wê berevajî kirine.

Danîelle Mîtterrand demeke dirêj biryara nepeyvînê bi çapemeniya Tirk re standibû. Hatina wê ya Amedê, di 1989'an de, ji aliyê çapemeniyê ve bi awayekî nebaş hatibû nirxandin û rexneyên tûj lê hatibûn girtin. Tê zanîn ku Mîtterrand, ji bo serdana pêşmergeyan hatibû Kurdistanê, rewşa penaberên Kurd di cih de dîtibû û kirinên li ser gel, yên hovane protesto kiribû. Ev helwestên wê jî hêla çapemeniya Tirk ve wek "rizgarker û diya Kurdan" hatibûn şîrovekirin.

Mîtterrand li ser hevpeyvîna wê ya ku di Milliyetê de derketibû, car din kete rojeva Tirkiyeyê. Lê piştî weşîna hevpeyvînê, rastiyek derkete holê. Tekzîbek ji aliyê Mîtterrand ve hate belavkirin. Tê de bal tê kişandin ku gotinên wê hatine berevajîkirin û dadixuyîne ku, ji ber ku xwendevanê Tirk hatine xapandin, ew xemgîn bûye.

Ev hevpeyvîna ku bi Danîelle Mîtterrand re, ji aliyê Nûnerê Özgür Gündemê yê Ewrûpayê Behçet Avşar û nûçevanê wê Haydar Erdoğan ve hatiye kirin, em bi kurtî diweşînin.

Hevpeyvîn di hejmara 530 ya bi mêjûya 23'ê Reşemiyê de hate weşandin.

### ÇAPEMENIYA TIRK XWENDEVANÊN XWE DIXAPÎNE

* Dikarim bibêjim ku niyeta min î pak bû bela serê min. Ez naxwazim bi rojnamevana ku bi min re hevpeyvîn çêkiriye re bikevin gengeşiyê. Piştî sala 1989'an çapemeniya Tirk der heqê min de bi tiştên gelek biçûk dest bi gotegotê kir. Em bi van tiştan dikeniyan û me bawer nedikir ku Tirkê hişê wî li serê wî be, guh bide van tiştan. Lewre ev cure tişt dibin pêkenî, tiştên wiha agahdariyê (înformasyonê) dikujin.

Tiştên hatine nivîsîn di rastiyê de tu têkiliya wan bi ramanên min re nîn in. Xembar im. Ez ji bo çapemeniya Tirk a ku bi vê yekê xwe biçûktir kir, xemgîn im. Bi taybetî, ji bo xwendevanên Tirk ku careke din hatin xapandin jî xemgîn im.

### ALÎKARIYA MIROVPERWERÎ JI SIYASETÊ NAYÊ QETANDIN

* Alîkariya mirovperwerî ji siyasetê nayê qetandin. Bi taybetî, dema ku jiyana gelekî mijara gotinê be, ev wiha ye. Em ji bo domandina jiyanê alîkariyê dikin. Çima em bi tenê ji bo jiyanê alîkariyê dikin? Ji bo giramî (hurmet) nîşandina domandina jiyana polîtîk. Ev jî dibe mesajeke siyasî.

### HÊZA ME YÎ TEŞHÎRKIRINÊ HEYE

* Rayeyeke me yî sekinandina dewleteke, ku ji bo qirkirina gelekî artêşa xwe bi rê xistiye tune. Rayeyeke me yî ku karibe biryar bistîne ku, demokrasî bi hemû prensîbên xwe pêk were jî tune. Em nikarin biryareke wiha bistînin.

Lê hêza me yî, ku kare hemû sûcên hatine kirin teşhîr bike heye. Hêza me yî, ku kare demokrasiya jirêderketî teşhîr bike, heye. Bêguman hikûmet dikarin bibêjin, "Ev me eleqedar nakin." Lê bi tekrarkirinê mesele digihîje cihekî. Rewşeke wiha heye ku her hikûmet, li pêşberî her welatî û Neteweyên Yekbûyî berpirsiyarê hesabdayînê ye. Dema ku bi tiliyê bêne nîşankirin, hikûmetên din jî dest bi "Êdî bes e" yê dikin.

### MA PÊDIVÎ BI KUŞTINÊ HEYE?

* Ev bi eynî aliyî ve diçe. Helbet neteweyî ye. Em axaftinên herdu hêlan jî guhdarî dikin. Yek ji muhafezekirina yekîtiya welatê xwe behs dike. Dibe ku mafdar be jî. Lê ji bo muhafezekirina yekîtiya welêt pêdivî ma bi kuştina jin, zarok û mirovan heye? Hêla din dibêje ku ew ne li dijî yekîtiya welêt in. Dibêjin ku, "Bi tenê em dixwazin li Tirkiyeyê bi zimanê xwe, bi çanda xwe û wek Kurd bijîn." Em vê jî dibihîsin. Beriya her tiştî, ji bo jiyîna wek Kurd pêwistî bi nemirinê heye.

### GIRANIYA ALÎKARIYA ME LI SER KURDÊN IRAQÊ YE

* Alîkariya me ya bi Kurdan, bêhtir giraniya xwe da ser Kurdên Iraqê. Ji bo hêvotina (terbiyeya) zarokan, me dest bi bernameyeke fireh kir. Îro weqfa me ji bo ku 50 hezar zarok bixwînin alîkariyê dike. Me 40–50 dibistan lêkirin. Çima? Ji ber ku dikaribû bi awayekî fîzîkî jî herin herêmê. Li herêmê bi cihbûna Neteweyên Yekbûyî û muhafezeya wê li serê heye. Em ji wan alîkariyê distînin. Li Tirkiyeyê ev şert nîn in.

* Di gel daxwazên Kurdên Îranê ew (Weqfa Azadiyan a Fransayê) li Îranê tu projeyeke alîkariyê nikare bimeşîne. Rêveberiya Îranê rê nade vê yekê. Ev jî rewşa wê derê ya xetereyî dide nîşan.

### ÇARE AŞTÎ YE

* Lihevhatina her sê welatan jixwe ne ji bo şadîbûna Kurdan e. Qethî ne ji bo şadiyê ye. Em jî wek we dibînin û haya me jê heye. Lê ev yek, zorê dide me ku em bifikirin. Belkî ne Fransa, lê em saziyên mirovperwer protestoyên xwe didomînin.

* Tiştên ku li Iraqê diqewimin, li gorî vê herêma Tirkiyeyê bêhtir dihatin zanîn. Îro êdî tu kes ez dibêjim qey nikare bibêje, "Tiştên li Tirkiyeyê dibin ez nizanim."

* Deh çare nîn in. Çare çi ye? An we gelê Kurd ji binî ve biqelînin, ku ev jî ne mimkûn e, deh sal e didome. Ji bilî jiyana di nav aştiyê de çare nîn e.

* Em dizanin ku li Tirkiyeyê Kurd hene. Di nav welêt de an jî, ji hev belavbûyî, tim hene. Niha heta ji dest tê, lê dixebitin ku kokê lê bînin. Gelek jê hewl dan xwe ku birevin, ji bo herin ku? Ewê tim li herêmê bin. 14 milyon mirov ji navê nayê hilanîn.

Ji ber vê yekê, êdî çare xwe defî pêş dide.

.........NÛÇEYÊN CENGÊ..........

# Berê şer fireh dibe

■ ***Li Kurdistanê di nav vê hefteyê de 11 leşker, polîsek û 27 sivîl mirin û 51 kesên sivîl jî birîndar bûn. Lê gava ku mirov li panoromaya vê hefteyê dinêre dibîne ku, hêzên dewletê bi sedan Kurd binçavkirine.***

■ ***Sedema girtin û binçavkirinan jî ji xwe xuya ye: Hilbijartin. Encama Hilbjartina 27'ê Adarê, ji niha ve hêzên dewletê ditirsîne û ji bo vê yekê jî endam û berandamên Partiya Demokrasiyê dibin hedefa êrîşên dewletê de ne.***

**Navenda Nûçeyan- 16 Reşemî 1994-** Li devera Bazê ku li ser Culemêrgê ye 11 cendekê leşkeran hate dîtin. Hêzên Tirkiyeyê piştî operasyona Zelê, li vê deverê jî dest bi operasyonan kiribûn û gelek leşker ji ber berfê winda bûbûn.

Êrîşên kesên nenas li Amedê bû sebeba kuştina 2 kesan. Di êrîşa yekemîn de xwendekar Hakan Yalçin (14) û di ya duyemîn de jî Muxtarê Taxa Mêrga Ahmedê, Recep Kutlay hatin kuştin.

Li Silopiyê hêzên dewletê bombe avêtin nav zorokên ku li sikakê dilîstin, Îbrahîm Şefik (5) mir û 3 zarokê din jî birîndar bûn. Roja ku ev bûyer çêbû li bajêr qedexeya derketina kolanan hebû.

Li Midyadê di nav sûkê de bombe teqiya, 8 kes birîndar bûn. Li Sasonê hêzên nenas, Nurî Ekîncî kuştin. Ekîncî endamê HEP'ê bû.

Hêzên dewletê li Sêrtê taxên Kurdan 70 kes binçav kirin. Sedema vê operasyonê jî ev bû ku, li hember polîsan êrîşek bi roketavêtinê çêbûbû. Di êrîşê de kes nemiribû.

Berendamê serbixwe yê Nehya Hîlalê ku li ser navçeya Qilabanê (Uludereyê) ye Alî Kara, bi teqandina mayinekê mir. Li gorî agahiyan, hêzên dewletê ev mayin xistibû rê û gava ku Alî Kara bi texsiya xwe derbas bû, mayin teqiya. Ji hêla din rayedarê DEP'a Rihayê Ömer Akpolat, li ser riya Pirsûsê (Sirûcê) ji aliyê leşkeran ve hate gullebarankirin. Ömer Akpolat di cih de mir.

**17 Reşemî 1994-** Li Amedê Mehmet Yoldaş di êrîşa kêsên nenas de hate kuştin. Li ser riya gundê Yukari Toprakliyê ku li ser Aralikê ye, mayin di mînîbusekê de teqiya. Bi navê Tevfîk Doğru û Îsa Dal 2 kes mirin û 8 kes jî birîndar bûn.

Mînîbusa ku ji Midyadê diçû Hesenkêfê, ji aliyê hêzên kontrgerîla ve hate gullebarankirin. Di êrîşê de Muxtar Yakup Mete (Suryanî) û yekî din jî ku navê wî nehat tesbîtkirin, mirin. Ji hêla din li Midyadê di 16'ê mehê de, ew 8 kesên ku bi teqandina bombeyan birîndar bûbûn bi navê (M. Alî Ayüz) kesek mir.

Li Bilîsê 2 kes (Cesîm Susam û Maşallah Îşlek), li Agiriyê yek (Seyîthan Bariş), li gundê Pîrkalê ku li ser Qerqeliyê (Özalp) ye 3 kes (Şahabettîn Erdem, Şahabettîn Akanöz û Şahabettîn ku, paşnavê wî nehatiye tesbîtkirin), li gundê Çokpinar û Akdîlen ku li ser Semsûrê ne jî 3 kes; (Şehrîban Bîlgîç, Rifat Cömert û Dervîş ku paşnavê wî nehatiye tesbîtkirin) ji aliyê hêzên dewletê ve hatine binçavkirin.

ERNK li bûyerên ku li hember avahiya navenda Partiya Refahê ya Êlihê û rayedarên, RP'ê ku di 16'ê Reşemiyê de hatibû birîndarkirin û li Kultursarayê ya Amedê, xwedî derket.

Ji hêla din, kesên nenas li hemberî avahiya Navenda Partiya Demokrasî ya Nisêbînê, êrîşeke bi molotof kokteylê anîn pê.

**18 Reşemî 1994-** Avahiya Navenda DEP'a Enqerê hate bombekirin. Ekrem Akçakaya mir û 20 kes jî birîndarbûn. Li gundê Sewadiyê ku li ser Banê (Güçlükonakê) ye, hêzên dewletê (tîmên taybetî û artêşa taybetî) Hamît Elik (63) dan ber gulleyan û kuştin, çar kes jî birîndar kirin.

80 kes ji gundê Aşaği Toprakliyê ku li ser Aralikê ye, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin. Ê ku navên wan bellî ne ev in: Eşref Doğru, Îsmaîl Mehmet Temtek, Ferzende û Yusuf Yumak.

Li Girêsorê (Sîwerek) cendekê yekî hate dîtin. Navê wî nehatiye tesbîtkirin.

Li Amedê di êrîşên kesên nenas de,3 mirov birîndar bûn. Li Êlihê jî, texsiya Midûrê Şûbeya Sümerbankê Abdurrahman Şahîn, hate bombekirin.

Li Tûxê (Tatwanê) Selamî Oruç û li Amedê jî mamoste û endamê Eğît-Senê Gürsel Eren hatin binçavkirin.

Li gundê Bostankale, Kocaköy û Bacaliyê ku li ser Dîgorê ne, ji 63 binçaviyan 42 kes derket mehkemeyê, 26 kes hatin berdan û 16 kes jî ketin girtîgehê.

**19 Reşemî 1994-** Cerdevanên gundê Sine û Şimşimê girtin ser gundê Mişrifê, ku ev gund li ser Licê ne, 18 xanî (mal) şewitandin û gundî li meydanên gundan civandin û bi wan îşkence kirin.

Hêzên leşkerî girtin ser gundê Filîkê (Donanli), ku li ser Qaqizmanê ye, 8 gundî binçav kirin û leşkeran li gund çadir vegirtin û bi cih bûn.

Li Êlihê di Otogara Midyadê de bombeyek, ji aliyê xelkê ve hate dîtin û berî ku bombe biteqe xelkê haya hêzên dewletê kişandin ser.

Hêzên dewletê li gundê Zoqeydê (Ayabağlar) Şêx Mazhar Sevgîlî û zêdeyî 20 gundî binçav kirin.

Cerdevanê (Abdülmutalîb Öztürk) ji gundê Yarımkaya ku li ser Qerqeliyê (Özalpê) ye, ji ber ku bêyî îzna hêzên dewletê ji wezîfê îstifa kiriye, ji aliyê qeymeqamê navçeyê ve der heqê wî de mehkeme hate vekirin.

**20 Reşemî 1994-** Li gundê Zakretê ku li ser Şemrexê ye û li gundê Kulê ku li ser Tuzlucayê ye, di navbera gerîlayên ARGK'ê û cerdevanan de şer derket, 8 kes (3 kes jin in) mirin.

Gerîlayên ARGK'ê li gundê Omeriyê ku li ser Cizîrê ye, santrala PTT û li Hezexê (Îdilê) jî traktorek şewitandin. Ji hêla din, li Misircê gerîlayan, depoya avê ya ku ji leşkeriyê re hatibû amadekirin, bi roketavêjan xera kirin.

Li Sêrtê tîmên taybetî, bombe avêtin malekê, 4 kes (2 zarok jî di nav de) birîndar bûn.

8 kesên ku li Bilîsê hatibûn binçavkirin, ji aliyê dadgehê ve hatin girtin û ketin girtîgehê.

Li Sêrtê Ömer Alevcan di dema binçavkirinê de, ji aliyê hêzên dewletê ve hate kuştin.

Li Stenbol û Ruhayê 78 leşker di nav mehekê de fîrar kirine. Li Stenbolê di nav vê demê de 15 leşkeran jî teşebusî xwekuştinê kirine.

**21 Reşemî 1994-** Li Amedê kesên nenas, Mehmet Aktaş kuştin û 2 kes jî birîndar kirin.

Gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser tesîsê BOTAŞ'ê ku li Êlihê ye. Di êrîşê de roket li tesîsan ketin û gelek xesar çêbû.

Li gundê Bacaliyê ku li ser Dîgorê ye 13 kes, li gundê Dayikê ku li ser Farqînê ye 4 kes, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin.

Tîmên taybetî 2 gundiyên (Şerîf Ak û birê wî) Mezrikê, ku li ser gundê Ecib a (Ardiçli ya) Kercewsê ye, xistin bin îşkenceyê. Herdu gundî jî ketin haletê mirinê.

Li Êlihê komek kesên nenas bi daran û beran êrîş birin ser xwendekarekî lîseyê M.Ş.Y û ew birîndar kirin.

Hêzên dewletê Çiyayê Gola Miharedê ku li Farqînê ye, dan ber topan. Sedemê bombekirinê jî qaşo gerîla li wir bi cih bûne.

Li gundê Marînê, Geliyê sor û Xirbê Mişkan ku li ser Nisêbînê ne, hêzên dewletê (4 hezar leşker û cerdevan) dest bi operasyonan kirin û dixwaze xelkê van gundan bibe cerdevan.

**22 Reşemî 1994-** Li Cizîrê 3 kes hatin kuştin. Di êrîşa hin kesên nenas de Ramazan Olgun û di ya din de jî, mamosteyek jin di hundirê dibistanê de hate kuştin.

Li Amedê kesek (Remzî Ok) ji aliyê gerîlayên bajêr ve hate kuştin. Bi hinceta ku Remzî Ok li ser navê PKK'ê ji xelkê pere distand.

Cerdevanên Çepekçûrê (Bingolê) bi zorê, gundan vala dikin. Heta vêga li gelek gundên Çepekçûrê (Seğî, Arcûk, Cafran, Hazerşah) û Kanîreşê (Karliova) ji ber pesta cerdevanan vala bûne.

Hêzên dewletê, ji bo destpêkirina operasyonên nû, bi otobusan leşkera dibin Êlih û Farqînê. Di van operasyonan de ta niha li gundê Farqînê Qirika, Hoşika û Dayika zêdeyî 100 gundî hatine binçavkirin.

Gerîlayan polîsek (Alî Özkara) li ser riya Qilaban û Şirnexê li devera Bestan kuştin.

# NÊRÎNEK

**Nîzamettîn Toğuç**

## Niyeta xerab

Yekî Ereb li deva xwe siwar e bi çolê ve diçe. Di rê de leqayî rêwiyekî feqîrok tê, dilê wî pê dişewite, dibêje: "Kifş e ku tu zehf westiyayî, were ez û tu emê doro doro li deva min siwar bibin." Feqîrok yek û dudu nake li devê siwar dibe û panî dide devê, devê direvîne. Mêrikê xwedanxêr rûdinê dibe nişqe nişqa wî digirî. Qasekî din çend rêwî têne balê, li halê wî dipirsin. Dema têdigihîjin ku deva wî revandine û ji bo wê yekê digirî, dibêjin: "Ji ser û sînçên te xuya ye ku tu mirovekî zengîn î, ne hêja ye ji bo deveyekê tu ewqas xwe digirînî." Mêrikê Ereb dibêje wan: "Ez ne li ser deveya xwe digirîm, ez jî zanim deve ne hêjayî girînê ye, giriyê ku ez dikim li ser niyeta min a baş e; min niyeta xwe ya baş winda kir, tirsa min ew e ku, êdî ez qenciyê bi kesî re nekim."

Gelê Kurd jî weke mêrikê Ereb lê hatiye, çiqas qenciyek bi dagirkerên xwe re kiriye bûye xerabî û hatiye pêşiya wî. Êdî baweriya wî bi dewletên Tirk, Ereb û Ecem nemaye. Piştî vê pest û perçiqandinê, piştî vê pêlkirina mafên mirovî, ku biratiya van dewletan nevê (nexwaze) kes nikare lê bigire û loma lê bike. Dîsa em dibêjin; ne ji bo rayedar û berpirsiyarên van dewletan, ji bo gelê Tirk û Ereb û Ecem hê jî bizûzahiyek li hêviya me maye. Belkî Xwedê ye, ev gel hişyar bibin, dest bidin hev, pêşî li xwe, dû re jî li hev û dinê xwedî derkevin. Divê ev jî bê pejirandin ku, êdî ji gelê Kurd re têkoşîna bê zor, bêqewet û bêdevê tivingê serketina wî ne mimkûn e. Berpirsiyarên vî şixulî jî dîsa dewletên dagirker in.

Ku pişta mirov tune be; ne dost hêviya ji mirov dikin, ne jî neyar fikaran ji mirov dikin. Pêşiyên me gotine; "Bi neh qenciyê re divê tixtek (hinek) tirs jî hebe. Gul giraniya bihayê xwe deyndarê sitirînên xwe ye. Sondxwarina bi devê tivingê, melhema devê birînên pirsgirêkên netewî ne."

Di demên tengasiyê de, çavên mirov li dost û hevalan digere. Ji aliyekî ve bûyerên xerab mîhengên pîvana dostan in. Ne ji wan be, belkî heta mirinê mirov hinek qellêş û nemerdan nas neke. Di rojên wisa ne xweş de; xwe firotin û reva newêrekî deynin dera ha, (ku niyeta wan xerab be) rexne girtina hevalan ji gullebarandina neyaran ne xweştir û zehmettir e.

*Bersiva "Bersiva rexneyeke bi lez"*

# Pêdivî bi zelalkirina daçeka 'bi'yê heye

**Zana Farqînî**

Tê zanîn ku pêwistiya me ne bi tenê bi xebatên ronîker, her wiha bi gengeşiyên (munaqeşe) ronîker û pêşvebir jî heye. Heke sînorê gengeşiyê ev be û ji vê çarçoveyê dernekeve, ez bi xwe alîgirê vê yekê me. Niha jî ez dixwazim bersivê bidim Mamoste Baran Rizgar û gotara xwe ya berê zelaltir bikim. Tariya li ser xalên ku ji gengeşiyê re bûne mijar, biqewitînim.

Di hejmara Welat a 92'yan de, di rûpela 10'an de bi sernivîsa **"Yê Kurd, yê Kurdan û yê Kurdî"** gotareke Mamoste Baran Rizgar hate weşandin. Min jî di hejmara 93'yan de û dîsa di wê rûpelê de, gotarek bi navê **"Bersivek der barê zimên de"** li serê nivîsî û rexne li hin xalên nivîsa wî girtibûn. Min raman û fikrên xwe der barê wan xalan de jî daxuyandibûn.

Piştre birêz Baran Rizgar di hejmara 102'yan de bersiva gotara min, bi navê **"Bersiva rexneyeke bi lez, Kurdî nav e û bi wateya zimanê Kurdan e"** da. Bi rastî ez li benda nivîsa wî bûm. Heke xalên ku min tê de şaşî kiribûna bi min bidaya hesandin, ez dê gelek kêfxweş û gewz bibûma. Lê, hîn Mamoste di serê nivîsa xwe de sebebê bersiva xwe wiha diyar dike: "Birêz Farqînî dibêje ku, *"Mamoste di vê nivîsa xwe de, bi ya min, di gel hin agahiyên ronîker ên li ser zimên hinên şaş jî dabûn."* Paşî jî dibêje, *"... Di rexnekirinê de çewtiyekê jî dike."* Îcar sedema ku min hewce dît ku ez dîsa li ser vê babetê rawestim, ev peyv in."

Belê, baş dixuye çima birêz Rizgar bersiv daye min û çima min bi "rexnekirineke bi lez" tewanbar dike.

Ji bo ku gengeşiya me ji tehmê dernekeve û ji armanca xwe averê nebe, min hem herdu gotarê wî û hem jî ya xwe, xwendin. Min bala xwe bi bêhtirî daye wan da ku, ez şaşî û çewtiyekê nekim. Niha jî ez dixwazim bi sernavan mijarê vekim û gotinên xwe bibêjim.

### FONKSIYONÊN TÎPA "Î" YÊ

Di zimanê me de ji yekî zêdetir fonksiyonên tîpa **"î"** yê hene. Ji bilî ku nav, rengdêr, têkiliyê û aîdiyetê di nav fonksiyonên xwe de dihundirîne, peywira tîpa tewangê ya yekehejmariya nebinavkirî ya zayenda nêrîtiyê jî, tîne cih. Bi gotineke din bi **"î"**yê hem nav, rengdêr tê çêkirin, pêwendî, aîdiyet û mensûbiyetê pê tê xuyandin û hem jî tewanga nêrîtiya peyvê ya yekehejmariya nebinavkirî dinûnirîne (temsîl dike). Ji bo vê rewşê baş ronî bikim, ez dixwazim mînakan jî bidim.

Zeviya av**î** (rengdêr)
Zimanê Kurd**î** (nav)
Xalit Begê Cibir**î** (mensûbiyet)
Şêx Seîdê Paloy**î** (Pêwendiya bi cografyayê re)
Hêzên dijmin**î** (tewang)

Min di nivîsa xwe ya **"Bersivek der barê zimên de"** ji bilî fonksiyona **"î"**yê ya tewangê, sê fonksiyonên wê yê din jî dabûn diyarkirin. Lê nizanim ji ber çi ye, Mamoste Baran di bersiva xwe de wiha gotiye: *Birêz Farqînî piştî van gotinan li ser tewandina navên Kurdî disekine ku rawe bike ku **"î"**ya di Kurdî de ne ji bo navçêkirinê, lê belê ji bo tewandinê ye."* Ez tika (rica) dikim bila ji nû ve li nivîsê bê nihêrtin. Tu îdîaya min î wilo nîn e.

Ji ber ku gengeşiya me li ser **"î"**yê çêbûye û mamoste îdîa dike ku qedînekên wek **"çanda Kurdî, ala Kurdî, civata Kurdî"** û hwd. bi tesîra Enstîtuya Kurdî dest pê kiriye, ez dixwazim dîsa bi mînakan, roniyê bidim ser mijarê. Feqe Huseyn Sagniç(**1**) li ser **"î"**yê wiha radiweste. Bêyî destlêdan ez vediguhêzim* "Navên nêr yên curedar dı devoka Buhtida **"ı"**ya veqetandeka nêriniyê dıgırın. Minak:

Zinê hesp**i**, serê beran**i**, rengê kaxez**i**."

> **Di zimanê me de ji yekî zêdetir fonksiyonê tîpa "î" yê hene.**
> **Ji bilî ku nav, rengdêr, têkiliyê û aîdiyetê**
> **di nav fonksiyonên xwe de dihundirîne, peywira**
> **tîpa tewangê ya yekehejmariya nebinavkirî**
> **ya zayenda nêrîtiyê jî, tîne cih.**
> **Bi gotineke din bi "î"yê hem nav, rengdêr tê çêkirin,**
> **pêwendî, aîdiyet û mensûbiyetê pê tê xuyandin**
> **û hem jî tewanga nêrîtiya peyvê ya yekehejmariya nebinavkirî**
> **dinûnirîne (temsîl dike). Ji bo vê rewşê**
> **baş ronî bikim, ez dixwazim mînakan jî bidim.**
> **Zeviya avî (rengdêr)**
> **Zimanê Kurdî (nav)**
> **Xalit Begê Cibirî (mensûbiyet)**
> **Şêx Seîdê Paloyî (Pêwendiya bi cografyayê re)**
> **Hêzên dijminî (tewang)**

Dîsa ez hewce dibînim ku bibêjim tewanga nêrîtiyê bi awayekî din jî tê çêkirin; ku li hin herêmên Kurmancî-axêv ev yek hîn di pratîkê de heye.

Hiriya ber**ê**n
Lawê Osm**ê**n,
Rûnê li ser n**ê**n.

### DAÇEKA "BI" Û FONKSIYONÊN WÊ

Li ser vê mijarê, ez di nivîsa xwe de bi awayekî kûr û fireh nesekinîbûm. Ji ber ku, min bi tenê xwestibû bidime zanîn ku ji bilî rewşên awarte (îstîsna) navê zimanê neteweyekê bi daçeka **"bi"** û **"î"**yê jî tê çêkirin. Di nivîsê de bi vê pragrafê min fikra xwe anîbû zimên:

*"Di zimanê Îngilîzî de bi alîkariya paşgira **"ish"**ê navê zimanê neteweyekê, di Tirkî de bi **"çe"**yê û di Kurdî de jî bi daçeka **"bi"** yê ku tê pêşiya peyvê û bi alîkariya **"î"** ya paşgir tê çêkirin."* Û min ev mînak dabûn:

*"Ez **bi** Kurd**î** dizanim*
*Rizgar **bi** zimanê Ereb**î** dipeyive"*

*Ji rewşên awarte re jî min ev mînak dabûn:*

*"Baran hînî Tirk**î** dibe*
*Alman**î** çawan e."*

Mamoste Baran Rizgar, li ser vê mijarê jî di bersiva xwe de rexneyên xwe wiha aniye. Vediguhêzim: *"Ma gelo "Kurdî, Îngilîzî, Tirkî, Erebî, Farisî û hwd." bi tena xwe, ne nav in û nayên wateya zimanên wan neteweyan? Li gora birêz Farqînî na. Ji bo ku bibin nav divê daçeka "bi" jî were. Pirr diyar e ku birêz Farqînî ev nivîsa xwe bi lez nivîsiye û li babetê qenc nekolaye, ji ber ku ew bi xwe dibêje "di Tirkî de..", " .. di Kurdî de" û hwd."*

De vêca ez teqdîrê ji we û birêz Baran Rizgar re dihêlim. Ez pêwîst nabînin ku bibêjim min wilo negotiye, ji ber ku herdu nivîs li ber çavan in.

Dîsa mamoste di eynî nivîsê de dide xuyan ku şaşiya ez ketimê, xwedêgiravî ji ber "bi şaşî ravkirina fonksiyona daçeka **"bi"** yê" ye. Li serê radiweste ku **"bi"** wateya wasîteyê dide û pê rengdêr rengpîşe (zerf) çêdibin. Pêşî pêdivî bi zelalkirina fonksiyonên daçeka **"bi"** yê dibînim.

Ev mijar an ku fonksiyonên **"bi"**yê di pirtûka Celadet Bedîrxan û Roger Lescot(**2**) de, wiha tên daxuyandin:

"Bi", fikra wesîteyê, hacet, hevrebûnê û pêrebûnê dide.

Dîsa li ser **"bi"**yê wiha dibêje (**3**) ku hebûna çawaniyekê, taybetiyekê dide nîşan. Mînak:

Bi goşt (rengdêr)
Bi cih e (musaîd, îsabet)
Bi dev (rengpîşe)
Bi min re were (pêrebûn)
Bi hev re ne (hevrebûn)

Piştî zelalkirina mijarê ez dîsa dixwazim bibêjim ku, min îdîa nekiriye ji bo navçêkirina zimanên neteweyan bê nîşandan, pêdivî her bi **"î"**ya paşgir û daçeka **"bi"**yê heye. Car heye bêyî daçeka **"bi"**yê navê zimanê neteweyekê jî tê çêkirin.

Her çiqas birêz Rizgar bibêje ku bi çavê rêzimanî jî li mijarê nenihêrtiye û mebesta wî watezanî (semantîk) bûye jî, tu îbareyeke wisa di nivîsa wî de nîn e. Min jî dixwest ku bi awayê rêzimanî li nivîsa min binihêrta û rexne li min bigirta. Ji aliyê din ve, hin qalib hene ku ji aliyê rêzimanî ve çewt in, lê belê wek **"xeletiya meşhûr"** tên binavkirin. Lewma diviyabû ku, bihata diyarkirin bê ji çi aliyî ve li mijarê vekolaye.

Berî ku ez dawî li vê nivîsê bînim, min divê çend mînakan pêşkêş bikim.

...Kultura siyasî û nivîskî ya Kurd**î**... (M. Malmîsanij, Nûdem, hej.8, r.17)

...Dîroka çandeyî ya Kur**dî**... (Rojen Barnas, Nûdem hej. 8, r. 14)

...Tevgera ronakbîriya Kurd**î**... (M. Uzun, Nûdem hej. 8, r. 20)

Fermandariya Îngil**îzî** vê carê beriya ku dest bi êrîşê bike... (Gramera Kurdî ya C. Bedirxan û R. Lescot, Ji Hawar'ê, r. 751)


**ÇAVKANÎ**

1– Hêmana Rêzimanê Kurdî, r. 47, Weşanên Melsa, Stenbol 1991 ·
2– Kürtçe Gramerî, r. 242, Weşanên Doz, Stenbol
3– Berhema ku navê wê bihurî, r. 280

* Feqe Huseyn Sağniç, xwediyê rastnivîseke cihê ye û "ı" û "î"yê jî wek ên alfabeya (**ı, i**) Tirkî bi kar tîne.



Koma Rojhilat bi stranên xwe yên gelêrî û şoreşgerî beşdar rakirin govendê.



Koma Serhildan ya govendê di dema leyîstina govendên dora Gimgimê (Varto) tê dîtin.

# Di şevên çandî yên DEP'ê de rengên Kurdistanî

## Ji DEP'a Beyoğlu şahiyeke bi coş

**S.Berbang**

Roja 19'ê Reşemiyê, DEP'a navçeya Beyoğluyê şahiyeke bi xwarin li Salona Dîlanê ya Labellayê li dar xist. Û di vê şevê de berendama xwe ya ji bo serokatiya belediyeyê û yên ji bo meclîsa belediyeyê dan nasîn.

Şevê bi rawestîna kêliyekê li ser piyan ji bo giramgiriya şehîdan dest pê kir. Piştî axaftina Serokê DEP'a Beyoğlu Yusuf Çîrît, Koma Serhildan derket ser dikê (sehneyê) û govendên ji devera Gimgimê (Varto) pêşkêşî temaşevanan kirin. Li dû govendê, Serokê DEP'ê û berendamê serokatiya belediyeya Fatîhê A. Macît Kapazan, axaftinek kir û helbestekê ji Cegerxwîn xwend.

Serokê DEP'a bajarê Stenbolê û Berendamê Serokatiya Belediyeya Bajêr ya Mezin Dr. Kemal Parlak jî, di şevê de axaftinek kir û wiha got: "Şerê qirêjî sedemê pêkutiya li ser mirovên kedkar e, hêzên serwer barê vî şerî li ser milên kedkaran bar dikin. Em dixwazin hemû mirovên kedkar (Kurd, Tirk, Laz, Çerkez û Ereb) bi biratî bijîn. Niha di rojeva Tirkiyeyê de, di rêza yekemîn de pirsgirêka Kurdî heye, lewre di rojeva me de jî ev pirsgirêk cihekî taybetî digire." Dr. Kemal Parlak piştî axaftinê, Berendama Seroka Belediyeya Beyoğlu Ayşe Karadağ û berendamên meclîsa belediyeyê dan nasîn. Ayşe Karadağ bi Kurdî dest bi axaftinê kir û got: "Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e!" Piştî ku xêrhatina mêvanan da, bi Tirkî bernameya xwe xwend. Di nav mêvanan de hunermend Halîl Ergun bal dikişand ser xwe, ne tenê ji ber hunermendiya (artîst) wî, ji ber ku ev jî, ji SHP'ê Berendamê Serokatiya Belediyeya Beyoğluyê bû. Halîl Ergun, axaftineke kurt kir. Li hemberî gihîştîbûna temaşevanan şermezar bû, ev rewş ji xwedan û sorbûna wî dihate fêmkirin.

Ergun di axaftina xwe de wiha got: "Min her tim di nav refên azadîxwaz, demokrat û berxwedaran de cih girtiye û ji bo biratiya gelan kar kiriye, ez mirovekî sosyalîst im. Pirsgirêka Kurdî li Tirkiyeyê ji bo demokratbûna mirovan wek kaxezê turnosolê ye. Ez niha jî xwe wek mirovekî ku hesab dide gelê Kurd dibînim. Lê ez ne berendamê partiyekê tenê me, berendamê hemû çepgiran im."

Komên ku bi stran û klamên gelêrî beşdarî şahiyê bûbûn ev bûn: Koma Amed, Grup Erenler, Koma Vengê Welat, Koma Rojhilat.



Ayşe Karadağ

## Ji ciwanên DEP'a Stenbolê şahiya piştgiriyê

**Mihemed Ronak**

Komîsyona Ciwanan a DEP'a Bajarê Stenbolê, bi beşdariyeke mezin, şeva xwe ya piştgiriyê çêkir. Şev di 19'ê Reşemiyê de li Bahçelîevler, li Zafer Sînemasi'yê çêbû. Zêdebûna polîsan û pêkutiya wan, gelek bala gel kişand.

Şeva Piştgiriyê ya Komîsyona Ciwanan a DEP'a Bajarê Stenbolê, bi beşdariyeke mezin bi keç û xortan û bi coşeke xurt û heyecan çêbû. Dikare bê gotin ku, piştî gelek şev û şahiyên navçeyên DEP'ê yên bêdeng û bêtevger, yeke cihêreng û livdar çêbû. Heta peywirdar (wezîfedar) di kontrolkirinê de gelek zorahî didîtin û zehf hewl didan xwe ku pergala şevê li bindestê wan dernekeve.

Di şahiya Komîsyona Ciwanan de dirûşmeyên balkêş jî, di gel mudexalekirina peywirdarên salonê, hatin avêtin û axaftinên Serokê DEP'ê Bajarê Stenbolê Dr. Kemal Parlak û endamê Civata Bajêr a DEP'ê Şemsettîn Kara jî dihatin birrandin.

Dr. Kemal Parlak di axaftina xwe de li ser binpêkirina mafên mirovan, pêstûrî û cerdên li ser Partiya Demokrasiyê, bombekirina Navenda DEP'ê, kuştin û girtina endamên wan, koçkirina gel ji Kurdistanê û binçavkirina berendamên wan î belediyan sekinî û daxuyand ku, ji niha pê ve xebat û peywirên endam û dilxwazên wan dest pê dike.

Endamê Civata DEP'ê ya Bajarê Stenbolê Şemsettîn Kara bi Kurmancî pêşî li beşdaran silav kir û pişt re bi giştî li ser rewş û mafên ciwanan rawestiya. Kara di axaftina xwe de, derbiriya ku ciwan wek dahatûya civakê tên nirxandin, lê tu mafekî wan nîn e. Şemsettîn Kara li ser ciwanên Kurd ên ku ji ber koçkirinê hatine Stenbolê jî peyivî û diyar kir ku, Stenbol wek kargehekê wisa ye, kesên têkevinê ji mirovahiya xwe dûr dikevin.

Şahiya Komîsyona Ciwanan bi Kurmancî û bi Tirkî hate pêşkêşkirin. Şev ji aliyê programê ve jî dewlemend derbas bû. Koma Çiya, Koma Amed, Ganî Nar, Bîlgesu Erenus, Koma Govendê ya Birîndar, Özgür Sanat Halk Tiyatrosu.

Sloganên ku di gel hemû têkilîkirina peywirdaran pirr dihatin qîrkirin hin jê ev bûn:

"Bimre Faşîzm, Bijî Sosyalîzm, Bijî Biratiya Gelan, Ciwanine em herin Kurdistanê ji bo şer."



Kemal Parlak

# Dîroka salnameya Kurdan

**Niwa Hebîb**

Salnameya Kurdî, 700 sal berî zayînê dest pê dike. Ew sal dewleta Med, li welatê Mîdya hatiye damezirandin.

Sersala Kurdî bi roja Newrozê dest pê dike (21'ê Adarê), roja Şoreşa Kawayê Hesinkar e. Li gelek deverên Kurdistanê adetekî kevin ku niha jî tê parastin heye, ew jî, roja Newrozê agir pê dixin û dîlok û stranên berxwedanê dibêjin.

Çarşema yekemîn a piştî Newrozê jî, her kes derdikeve seyranê û xwarinên xwe li derve dixwin. Ji vê rojê re dibêjin Çarşema Sor. Ji xeynî vê jî, roja çarşemê wek roja tatîl, seyran û ji mal derketinê hatiye hesibandin û hê jî li başûr û rojhilatê Kurdistanê bi vî awayî ye. Dibe ku çarşem di dîroka kevnare ya Kurdan de ya berî îslamî, wek rojeke pîroz be. Lê em der barê vê yekê de ne xwedî çavkanî ne.

Mînak: Newroza îsal, 21'ê Adara 1994'an e. Li gor salnameya Kurdî ev mêjû dibe, 1'ê Axleve ya sala 2694'an. Lê îro ku em vê gotarê dinivîsin 23'yê Sibata 1994'an dibe 3'yê Reşemeha sala 2693'yan a Kurdî (Li tabloyê binêrin).

Meh û heftî û salnameya Kurdî, li ser bingeha guherînên xwezayî, çandin û sewaldarî hatiye avakirin:

Baran kengê dibare û di çi demê de tê birrîn?

Berf kengê dibare, kengê rê tên girtin?

Zevî kengê hêşîn dibe, giya hişk dibe?

Dema palehî, ber bi zozanan ve çûyîn, xwendina kewê li ser şaxên daran, an li ser keviran, stêrka Gelawêj kengê derdikeve?

Ji bo nimûne: Stêrka Gelawêj di navbera 21'ê meha 8'an heta 19'ê meha 9'an, tê xuyan û bi vî awayî nav lê hatiye kirin. Lê, li gor salnameya Enstîtuya Kurdî, ku weke fermanekê dane saziyên Kurd ên din û ew jî bê îtîraz qebûl kirin, meha Gelawêj wek meha 8. (Agustos) hatiye qebûlkirin. Bi wateyeke din 20 roj cudahî, şaşî çêbûye di hesab de. Ev guherîn jî nabe guherîneke zanistî. Lewre salnameya Kurdî, li gor mercên xwezahî hatiye danîn. Nimûneyek din jî; dîsa li gor salnameya Enstîtuyê, meha 3'yê Mîladî (Adar, March) bûye Axlêve. Lê meha Axlêve, li gor salnameya Kurdî dikeve navbera 21/3 heta 20'ê meha 4'an. Li gor salnameya Enstîtuyê sersala Kurdî 20 roj bi pêş ketiye. Herkes dizane ku 21'ê Adarê ya Newrozê, sersala Kurdî ye lê li gor hesabên Enstîtuyê sersal winda dibe.

### NAVÊN MEHAN Û ŞÎROVEYA WATEYA WAN

**Meha yekemîn:** Xakelêwa, Axelêwa, Axlêve (Xak: Ax e, lêw: lêv e)

Destpêka biharê, dema ku zevî ji nû ve hêşîn dibe ye. Hêşînayî hê nû ji axê derketiye, gava ku sewal (pez, bizin, çêlek û hwd.) diçêrin, çêre tevî xweliyê hiltînin, vêca ew ax li ser lêvên wan dimînin. Ji ber vê yekê, ji vê mehê re "Axlêve" hatiye gotin. Ew dem li deştan berf hê nû dihele. Tav derdikeve, bayekî sar tê. Jê re dibêjin bayê darbişkêfê. Babişkêf, ew ba ye ku kulîlk û çîçekên daran pê vedibin. Tevizîna sermayê dişkê. Ax dikeve ser lêvên salê û ew sal dimire, bi awayekî din, sala kevin diqede. Roj dirêj dibin.

"Tu bi xêr hatî mêvanê ezîz
Bi roja bihar, bi şeva payîz"

**Meha duyemîn:** Gulan, Banemerr, Şêstbaran (Ban: Banî, Merr: Pez)

Berf li serê çiyan dihele. Av li çem û şaxên çeman zêde dibin. Deşt û aran germ dibin. Pezdar pezên xwe dibin zozanan, serê çiya û baniyan. Ji ber vî awayî, ji vê mehê re "Banemerr" (banepezan) tê gotin. Hêşînayî li hemû zeviyê belav bûye, êdî li her derê bihar e. Kulîlkên zer, sor û mor vedikin û ew meh jî dibe "Gulan". Baran ku dibare ji bo demeke kin û gurr dibare. Baraneke têrav e, jê re dibêjin "Şêstbaran"*. Piştî baran disekine, hewa careke din germ dibe û di vê navê de darên hirmiyan kulîlkên xwe vedikin (dibişkifin). Li hin deveran, ji vê mehê re "Hirmêbişkivan" jî tê gotin.

**Meha sêyemîn:** Cozerdan, Codirew, Baranbirran, Kewbedar (Co: ceh, Zerdan: Zerbûn, Direw: dirûn, yan jî çinîna ceh)

Dema zerbûna cehê û palehiya wê ye. Êdî baran nabare. Li gundan çivîkeke biçûk û reşegewr, ku hêlîna xwe di qullên xaniyan de û di cihên asê de lê dike û tûj difire, jê re dibêjin, "Baranbirre". Gava ku tê, dibe nîşana dema nebarana baranê. Hin salan, di vê mehê de li hin deran baran dibare. Ji ber vê jî, ji vê mehê re dibêjin "Berfebaran". Di vê mehê de kew li ser şaxên daran dixwînin. Kurd dibêjin Ev meh meha kewbidarê ye." Kewbidar nîşana dawiya biharê ye.

**Meha çaremîn:** Pûşperr (Dema hişkbûna pûş e)

Giya hişk bûye û bûye pûş. Di vê mehê de palehiya pûş tê kirin ku ji bo zivistanê, ji xwarina heywanan re hilînin. Hingî ev meh germ e, li hin deveran, jê re dibêjin "Germaciman" (Cimîn: Kelîna hewayê) Di Kurmancî de jê re "Tîrmeh" (meha tîr, sift) hatiye gotin.

**Meha pêncemîn:** Xermanan, Coxînan

(Xerman û coxîn herdu jî bênder in)

Di vê mehê de bênder tên hilanîn. Dinya pirr germ dibe. Hewa û ax ji germê dikelin. Rengê erdê bi sorahî ve diçe. Di Kurmancî de jê re "Tebax" tê gotin. Teb: Tav. Yanî tav û ax wek hev germ dibin. Di gotineke pêşiyan de jî "Tebax e tirî raxe" tê gotin. Yanî tav pirr tûj e û têr dike ku tirî li ber germa wê bibin mewîj.

**Meha şeşemîn:** Gelawêj

Gelawêj stêrkeke geş e, di temamê salê de bi roj xuya dike. Jê re dibêjin stêrka rojê (Qorix).

Di vê mehê de Gelawêj bi şev derdikeve. Derketina wê ya şevê êdî nîşana xelasbûna havîn û germahiyê ye, wekî din ber bi payîzê ve çûyîn e. Mêw bi temamî digihîjin û berdidin. Gotineke pêşiyan wiha dibêje: "Ku Gelawêj kete ber şevê, destê xwe dirêj bike berîka mêwê."

**Meha heftemîn:** Rezber

Ev meh meha bi temamî gihîştina fêkiyan e. Rez û bax ber (mahsûl) didin. Li hin deran, jê re "Kergehan" (dema ku tirî digivêşin ji bo dims) tê gotin.

Aboriya civaka Kurd, pişta xwe bi çavkaniyên rez û pez ve girê daye.

Di gotinên pêşiyan de "Gundên b rez û konên bêpez ji çi re ne."

Mêrek ji jina xwe dipirse:

– Bi te li dinyayê çi xweş e?

Jin: Biharê pez û ez
Havînê tez û ez
Payîzê rez û ez
Zivistanê bez û ez.
(Tez: tevz)

**Meha heştemîn:** Gelarêzan, Xezan, Xezelwer, Kewçerîn

(Gela, Xez: Guliyên darê)

Di vê mehê de pelên daran diweşin. Makew li ser keviran diçerin. (Çerandin: Xwendina teyra), Gazî kewê nêr dikin. Roj kurt dibin. Kurd dibêjin: "Roviyên payîzan ji qulên xwe dernakevin, dibêjin payîz sibehê sar e, piştî nîvro jî zû dibe êvar e."

Di vê mehê de cejneke Cihûyên Kurdistanê heye, Kurd jê re dibêjin Kepreşîneya Cihûyan. Cihû di vê cejna xwe de derdikevin derveyê gund û bajaran, li wir ji xwe re inzêlan çêdikin, lê ku baran lê dike inzêlên wan xera dibin û mecbûr dibin vegerin. Kepreşîne jî, yanî inzêla hêşîn ku bi dar û beran tê lê kirin.

**Meha nehemîn:** Sermawez

Werza (mewsîm) sermayê. Di vê mehê de, kes li derve namînin. Pezdar ji zozanan dadigerin. Payîz ber bi xelasbûnê ve diçe û werza sermayê dest pê dike. Barêjne tê û baran dibare.

Çileyê Pêşîn çil roj e, jê re Çileyê Mezin tê gotin. Ji 16'ê Sermawez dest pê dike heta 25'ê Berfanbarê didome. Lewre mirov nikare çil rojan bike navê mehekê ku her meh ji 31 rojan nabihure. Çileyê Paşîn jî bi vî awahî ye. Ew jî, ji 26'ê Berfanbarê heta 5'ê Reşemehê didome. Ji Çileyê Paşîn re dibêjin Çileyê Hirçê jî. Lewre hirç di vê demê de dikevin xewa zivistanê. Kurd dibêjin,: "Çil roj piştî çile hê bihara ji dil e." 40 roj piştî çile dibe 16'ê Axlêve.

**Meha dehemîn:** Berfanbar

Zivistan dest pê dike. Li her aliyî berf û bager e. Deşt û zevî di bin berfê de dimînin. Rêwî li çiya û baniyan, riyên xwe winda dikin.

**Meha yanzdemîn:** Rêbendan

Rê ji berfê tên girtin. Gund û avahiyên nav çiyan ji hev diqetin. Kes ji malên xwe nikarin derkevin. Mezin û zarok li ber agir rûdinin û ji hev re dikevin deng û behsên serpêhatî û çîrokan. Ev jî dibe bingeh ji dewlemendiya çanda devkî re.

**Meha diwanzdemîn:** Reşemeh

Ev meh destpêka helandina berfê ye. Cih bi cih reşahî dikeve erdê. Taveke nîvgermî lê dide. Ji ber ku mirov di dema zivistanê de, ji tavê dûr dimîne, di vê mehê de bi rojên tavîn yên pêşî çermê rûyê însên bi reşahî ve diçe, dişewite, diqemire. Wekî din jî êdî hino hino qûtê salê ber bi qedandinê ve diçe û ji bo rojên reş tîne pêşiya kesên jar û belengaz. Ji ber van sedeman, ji vê mehê re "Reşemeh" tê gotin. Kurd dibêjin:

"Reşemeh reşika rû we
Xalî dibin çal û kendûwe
Şer dikin bûk û xesûwe."

Di vê mehê de wekî din, dema cotbûna pisîkan e, li her derê dibe wire wira wan.

| Werz (Mewsîm) | | Navê mehên Kurdî | Hejmara roj | Mehên Kurdî li gor Mîladî |
|---|---|---|---|---|
| | 1 | Axlêve, Xakelêwe | 31 | 21/3 – 20/4 |
| BIHAR | 2 | Gulan, Banemerr, Şêstbaran | 30 | 21/4 – 20/5 |
| | 3 | Cozerdan, Baranbirran, Kewbidar | 31 | 21/5 – 20/6 |
| | 4 | Pûşperr | 30 | 21/6 – 20/7 |
| HAVÎN | 5 | Xermanan | 31 | 21/7 – 20/8 |
| | 6 | Gelawêj | 30 | 21/8 – 19/9 |
| | 7 | Rezber | 31 | 20/9 – 20/10 |
| PAYÎZ | 8 | Gelarêzan, Kewçerîn | 30 | 21/10 – 19/11 |
| | 9 | Sermawez | 31 | 20/11 – 20/12 |
| | 10 | Berfanbar | 30 | 21/12 – 19/1 |
| ZIVISTAN | 11 | Rêbendan | 31 | 20/1 – 19/2 |
| | 12 | Reşemeh | 29 – 30 | 20/2 – 20/3 |

**Jêrenot:**


* Şêstbaran: Hejmara şêst (60) di çanda Mezopotamya ya kevin de weke hejmareke girîng hatiye qebûlkirin. Lewre dabaşê gelek hejmaran dibe. Bê kusûrat dabaşê 60, 30, 20, 15, 12, 10, 6, 5, 4, 3, 2, 1 dibe. Lewre bûye hejmareke hesabî. Ev tişt di zimanê Kurdî yê gelêrî de hê heye. Şêstbaran bi wateyê baranê bi gur tê bikaranîn.

**Çavkanî:**

1– Ferhenga Hembana Borîne (Hejar Mukriyanî)

2– Defterên têbiniyên taybetî

# Kurd û demokrasî



*Kurdên ku ji bo azadiyê têdikoşin, naxwazin ji bin destê dîktatoriyekê derkevin û têkevin bin destê yeke din.*

**Jan Dost**

Eger miletên cîhanê bi xwînrijandinê gihîştin demokrasiyê, ê me Kurdan fersenda me heye ku em bi hiş û bi mejiyekî rewşen û vekirî; demokrasiyê bikin rejîma jiyana xwe. Demokrasî pirsa herî pêwist e di jiyana miletan de û em berî her miletî hewcedarî demokrasiyê ne. Ji ber ku em ji niha ve hînî jiyaneke demokrat nebin, di pêşerojê de gelekî zor û zehmet e.

Dewletên sosyalîst yeko yeko hilweşiyan, bêguman ne ji ber ku fikra sosyalîzmê fikreke çewt bû, lê ji ber ku rejîma sosyalîzm bi rengekî çewt pêk hat. Yek ji çewtiyan ev e ku ev dewlet li ser bingeheke ne demokrat ava bûbûn, rê li ber her fikrên din hatibû girtin, Partiyekê bi tenê hikûm dikir, ji hundir ve ev dewlet dikeliyan. Weke beroşeke sergirtî, ta ku ji nişka ve qapax firiya... Dûkel nikaribû di wî cihê teng de bimîne... Li gor nêrîna marksîzmê, divê ev dewlet hîn pêşdetir çûbûna û bigihîştana paya komunîzmê, ne bes wiha, divê rejîmên Ewrûpayê yên sermiyandarî tev di bin zora tevgera proleterya de hilweşiya, lê berevajiyê vî tiştî çêbû, Ez ne di wî warî de me ku bibêjim kîjan rejîm rast e, lê ez rastiyeke dîrokî didim ber çavan û dixwazim bibêjim; bêdemokrasîmabûna rejîmekê zor e, çendî ew rejîm dirêj bike wê dawî hilweşe.

Dewletên sosyalîst bûbûn warê dîktatoriyên mezin, wek bi fikreke bi tenê, nêrînek li jînê bi tenê, partiyek bi tenê û serokekî bi tenê, hikûm dikirin.

Îcar divê haya me Kurdan baş ji vê pirsê hebe, ji niha ve divê milet hînî jiyaneke demokrat bibe. Em di dawiya sedê bîstan de ne, şermeke mezin e ku em ji bin dîktatoriya dijmin têkevin bin siya dîktatoriyeke din, em ji bin barê bindestiyê derkevin û têkevin bin barê bindestiyeke din, weke me tu kar nekir û evqas xwîna ku hate rijandin tev hedir çû!

Demokrasî ne kirasekî ku em li xwe bikin, yan navekî şîrîn e em li partiyên xwe bikin û bibêjin: Binêrin... Em demokrat in! Demokrasî berî her tiştî azadî ye, jixwe **Eflatûn** di pirtûka xwe de (Komar) li ser zimanê fîlosofê Grîkî **Sokrates** wiha dibêje: "Tiştê herî xweş di demokrasiyê de, azadî ye!"

Ev azadî jî, azadiya di her warî de ye, azadiya ol û dîn û baweriyê ye, azadiya jîn û rewşa jiyanê ye, azadiya fikr û endîşeyê ye.

Lê di vê babetê de pirseke pêwist heye, divê ez ronî bikim. Em Kurd, di nava şoreşê de ne, eger yek serî li ber vê şoreşa me rake û bibe bend li pêş lehiya serxwebûnê û dest têxe destê dijmin. Bêguman ne durist e em doza demokrasiyê li tevgera şoreşê bikin û bibêjin: "Ew jî Kurd in, nêrîneke wan jî heye!" Ev kelem in di pêş şoreşê de, divê bê dilovanî ji rê derên. Tengbinî, yan awirtengî, ziyaneke mezin e ji civaka Kurdî re, ya ku di her warî de paşketî maye re. Eger demokrasî hebe em navberîtiya xwe nakin tiving û xwînrijandin, ev yek li civakên herî şûndemayî çêdibe, ne li civakeke ku xwe ji jiyaneke azad û serbixwe re amade dike û hêz dide xwe, da ku têkeve sedê bîst û yekan.

Eger rojnameyeke Kurdî weke **Welat**, qedexe bibe bi navê Kurdîtiyê, eynî wek dîktatoriyê ye, ew terefê qedexekar kî dibe jî bila bibe û her wiha çi rojnameyê Kurdî yên din hebin.

Di vî warî de rola mezin, ya nivîskar û rewşenbîrên Kurdan e, eger ji niha ve li hember van çewtiyan ranebin û tim xwe li ser şaşiyan kerr bikin, wê civaka Kurdî ji bindestiyekê têkeve bindestiyeke kambaxtir. Divê rojnameyên Kurdî û pênûsên nivîskarên Kurd, xebatkarên vê dozê bin û deriyê rexneyê li piştê vebe, lê di sînorê aqil û mejiyekî vekirî de, ne bi dijûnî û sixêf û gotinên vala.

Ji niha ve, divê rojnamevaniya Kurdî serbixwe be û meydana her cure fikr û ramanî be.

Armanc yek e, lê rê gelek in û weke metelok dibêje: Rê tev diçin aş. Her yek wê bide ser riyekê û wê li ser wê riya xwe were rexnekirin jî, çi rast be û çi şaş be.

Tu carî ne mimkûn e civakeke reş û pan weke ya Kurdî tev de weke hev bifikirin, weke hev bibêjin û weke hev bijîn. Çawa di warê konevaniyê de demokrasî pêwist e, wiha jî di warê tore û edebiyatê de, di warê huner û endîşeyê de jî...

Yê ku demokrasiyê napejirîne, eşkere dike ku bingeh û binyata avahiya fikra wî gelekî sist e, ew ji xwe ne bawer e, weke helbestvanê ku zanibe helbestên wî ne tiştek in, ji rexneyê ditirse.

Ji bo pêşxistina civakê, ji bo jiyaneke bi rûmet, demokrasî çareya yekemîn û dawîn e.

# AZADÎ



**Abdurrahman Durre**

## Cemîl Beg û Sertîp Axa

Sertîp Axa yek ji axayên Eşîra Hesenan, xelkê Dignûga Melazgirê bû. Ew di dema Serhildana Şêx Seîd de terefdarê hikûmeta kemalîstan bûye. Kemalîstan ew xapandibû, gotibûn ku emê te bikin qeymeqam û tuyê bi tenê bimînî axa. Piştî demeke dirêj ku êdî pêdiviya wan pê namîne, nameyek dinivîsin, didin Sertîp Axa. Dibêjin: "Tuyê bibî qeymeqamê Kopê (Bûlanixê). Ev name ya qeymeqamiya te ye, wê ji qumandarê Kopê re bibe, tu ji vir û pê ve qeymeqam î. Her tişt di bin fermana te de ye, tu axayê welêt î." Sertîp Begê bi dijmin bawer dike û bi wan dixape, mektûba xwe hildide û şa dibe, tê Melazgirê. Mele Evdileyê Welo yek ji meleyên zana û şarezayê wê demê ji Sertîp re dibêje: "Ka nameya xwe bide ez bixwînim, çika tê de çi nivîsîne, paşê bibe Kopê, bextê Romê tune ye. Tu heta niha xapiyayî, ji vir pê ve nexape." Sertîp Axa qebûl nake û jê re dibêje: "Seyda, tu jî bi min re were Kopê, ezê te bikim tehrîrat katibê xwe." Mele Evdile ji Sertîp re dibêje: "Qeymeqam Beg, ez tehrîrat katibiya te naxwazim, here, oxira Çelo be ji te re." Sertîp Axa diçe Kopê û nameya xwe dide qumandan. Qumandanê teres nameyê vedike û dixwîne, li gora naveroka wî destê Sertîp li kelepçeyê dixe û girê dide. Dibe devê ava kor bi singûyan lê didin û dikujin.

***Divê ku yên wekî Erhan, Înan, Çetîn, Cevherî û Melîk Firat vê rastiyê tu demê ji bîr nekin û xwe nexapînin, bizanin ku dîroka gelê Kurd wê mitlaq bi pêsîra wan a gunehkar bigire û hesabê şehîdên Kurdistanê Şêx Seîd, Seyîd Elî û Şêx Şehabettîn, qetlîamên gelê Kurd ji wan bipirse. Eger ku di saxiya wan de nepirse jî, wê di mirina wan a qirêj de, ji dîroka wan û sulala wan pirs bikin.***

Ji wê demê ta niha ev mektûba Sertîp, di nav xelkê de bûye nîşana xapandin, xayînî, bêbextî û qeleşiya dijmin.

Wezîrê Dewletê Cemîl Erhan Begê Patnosî jî, bi mektûba Zeyneba Zer (Tansu Çîller) bû wezîrê dewletê. Wekî kalikê xwe yê Huseyn Paşa (Kor Huseyîn Paşayê Heyderî) bi dijminê bav û kalan xapiya û hevaliya wan kir. Milîtanê hikûmeta wan a faşîst heta ku Zeyneba Zer a şorek bi çepilê wî girt û ji wezîrtiyê avêt, serserî li erdê xist. Gotineke pêşiyan heye: "Dijminê bavan, nabin dostên lawan."

Mirov ku mêze dike, di dîroka Kurd û Kurdistanê de bi hezaran mîsalên xapandin û bêbextiyên wekî wan hene. Di her demê de bûne û hê jî dibin. Heta ku nezan û nexwendiyên wekî Sertîp Axa û Kor Huseyn Paşa hebin, wê ev xapandin û bêbextiyê dijmin jî, dewam bikin. Mirovên nexwendî û nezan, bi dek û dolabên dijminan zû dixapin, heta dereceyekê bêguneh in jî. Dema ji aliyên dijmin ve têne kuştin dibin şehîd jî. Lewre ew jî mezlûm in. Li gorî dînê îslamê jî, kesên ku mezlûm bên kuştin, şehîd in. Bi rastî jî, pirr gazin ji yên Sertîp Axa û Kor Huseyn Paşa nayê kirin. Lewre nexwendî bûn, dek, dolab, fend û fundên dijminan nedizanîn û fêm nedikirin û dixapiyan, qeleşî û teresî ya dijmin e. Lê xwendeyên ku dibin lîstoka neyar, bi zanetî ji gelê xwe û şoreş û serhildana wan a azadî û rizgariyê diqetin û dibin alîkarê dijmin ew nayên efûkirin û nayên bexşandin, gelê wan û dîroka gelê wan wê hesabê wê îxanet û xayîntiya dîrokî ji wan bipirsin û bi pêsîra wan jî bigirin.

Divê ku yên wekî Erhan, Înan, Çetîn, Cevherî û Melîk Firat vê rastiyê tu demê ji bîr nekin û xwe nexapînin, bizanin ku dîroka gelê Kurd wê mitlaq bi pêsîra wan a gunehkar bigire û hesabê şehîdên Kurdistanê Şêx Seîd, Seyîd Elî û Şêx Şehabettîn, qetlîamên gelê Kurd ji wan bipirse. Eger ku di saxiya wan de nepirse jî, wê di mirina wan a qirêj de, ji dîroka wan û sulala wan pirs bikin û di dîroka Kurd û Kurdistanê de wan xayîn û rûreş bidin diyarkirin. Xebereke pêşiyan heye: "Mirov ji ku derê zirarê bizivire, kar e." Divê ku ew zewatên kiram û ev dîplomatên hêja zû hişê xwe bînin serê xwe û ji sefên dijminê bav û kalên xwe derên û di nav gelê xwe de cih bigirin. Li hemberî hikûmeta faşîst a Zeyneba Zer û dewleta dagirker a Tirkan rabin û li gelê xwe xwedî derkevin, ku dernekevin wê rûreş û bêweş bibin...

# NATO û têkoşîna çekdarî ya gelê Kurd

**Zulfîkar Tak**

NATO'yê berê xebatên xwe li hemberî sosyalîzma real dimeşand. Piştî ku sosyalîzma reel hilweşiya, NATO kete valahiyeke mezin. Rista ku di cîhanê de dileyist tu egerên wê neman. Ji ber vê yekê hinek welatên ku endamên NATO'yê bûn, digotin: Divê NATO an xwe belav bike an jî risteke siyasî û armancake nû bide pêşiya xwe. Guftegoyên bi vî rengî wek berê nebe jî vê gavê jî didomin.

Bi rastî jî, ev roj ji bo dewletên împeryalîst, NATO wek berê ne hewce ye. Piştî hilweşandina sosyalîzma real, împeryalîstan di navbera xwe de li ser bazarên gerdûnê li hev û din hatin û derve li hev û din parve kirin. Navê vê parvekirinê jî kirin Sîstema Gerdunê ya Nû. Împeryalîzm, êdî kîjan deverê bixwaze, an jî, ji bo wan rewşeke çewt derkeve holê, di demeke kin de bi hêzên xwe yên leşkerî ve dikarin bigirin serê. Wek Şerê Xalîçê, Somaliyê. Ev mînak di hêla leşkeriyê de lezgîniya wan dide xuyakirin. Di biryara girtina ser deverekê an ser welatekî de, li ber împeryalîzmê tenê du asteng hene: Astenga yekemîn; vîn û rêxistinên gelên welatên ku bên dagirkirin, ya duyemîn jî; dubendiyên navbera baskên împeryalîzmê. Ku ji bo dagiriya deverekê împeryalîst li hev û din werin, tevgerên dagiriyê bi saya teknolojiyê dê di demeke kin de ku hereketa dagiriyê pêk bînin. Ji ber van rastiyan, ji bo împeryalîzmê NATO wek berê ne giring e.

Li hêla din, rewşa welatên ku di bin sîstema kedxwariya nû de ne, heye. Ev welat hê hewceyî siya baskê împeryalîzmê, NATO'yê ne. Di nava van welatan de yên ku rewşa wê herî xerab e, bêguman KT (TC) ye.



*Rola hêzên NATO yên leşkerî mîna berê nemaye.*

KT ji belavkirina NATO'yê zêdetir, hîn bêhtir xurtkirina wê dixwaze. Ji ber ku, ev deh–panzdeh sal e rejîma KT'ê di nava şerekî dijwar de maye û bi hemû hêzên xwe ve bi kotekiya leşkerî, siyasî, û aborî ve li dijî Kurdên azadîxwaz şer dike. Bi hemû derfetên xwe, bi hemû desteka împeryalîzmê, bi alîkariya kevnepestên herêmê û bi tevî bêbextiya xwefiroşên Kurd ve, KT rewşa ku ev roj dijî, tenê bi gotinekê xetimandin e.

Di sala 93'an de xetimandin û xerabbûna sîstema KT'ê, di temenê xwe yê heftê salî de gihîşt xala herî kûr. Dibêjin emê di sala 94'an de vî karî biqedînin. Par û pêrar jî wilo digotin. Ev sal plan, dek û dolabên wan î berfê jî vala derketin. Dixwestin binketina xwe bi alîkariya mercên xwezayî bidin sekinandin. Lê wek ku dixwestin nebû... Di butçeya îsal de, ji bo şerê qirêjî 167 milyar veqetandine. Ev meblax ji bo çînên hilberkar barekî giran e, darbeyeke mezin e. Wê gelê Tirk bikaribe barê vî şerê qirêjî yê aborî heta kengê rake, hêz û taqeta wî ne bêsînor e.

Gava ku em li karê KT'ê, yên qirêjî mêze dikin û encamên wê dinirxînin; binketineke pirr dijwar derdikeve holê li hemberî karê tevgera azadiyê. Ev rastî, têkçûyina împeryalîzmê jî dide xuyakirin li welatê me. Ji ber van rastiyan KT'ê hemû polîtîkayên xwe yên derve û yên hundur li gorî şerê azadiyê dimeşîne û li dar dixe. Lê di warê aborî, leşkerî, siyasî, bîrdozî, çandî, medya–çapemenî û di warê têkiliyên navneteweyî de hemû rûmetên xwe miçiqandin. Ji bo ku hebeke din bikaribe xwe li ser piyan bigire, vê gavê jî dixwaze Qıbris'ê bifiroşe.

Lê gelê Kurd, bi şerê xwe yê ku bi pêşengiya hêzên xwe yên hemdem dimeşîne, çeper û çarçoveyên kedxwariya Tirkiyeyê şikênandin, xerab kirin. Wek lehiyên biharê, wek aşîtên berfê bi ser dezgeh û damezraweyên KT'ê ve hat û hemû ji hev û din vekirin; weke goga agir xwe li avenda Rojhilata navîn xist. Ev rastî di polîtîkayên herêmê de jî tên xuyakirin, di hevdîtina Bill Clinton û Hafiz Esat de, xalên ewilî ya rojeva hevdîtinê li ser serokatî û serîhildanên gelê me bûn.

Ji ber vê rastiyê împeryalîzmê dest avêtiyê û li Brukselê biryar hate girtin di Civîna NATO'yê de. Împeryalîzm li çareya binxistina şerê Kurdan tenê nagere, li dijî sosyalîzma zanistî (ilmî) bi navê NATO'yê li çareya binxistina raperîna hêzên kedkar û hilberkar, a ku di xeta şerê gelê Kurdên azadîxwaz de pêk hatiye, digere.


Welatên ku endamên NATO'yê ne di Civîna Brukselê de biryar girtin ku, ji vê bi şûn ve li dijî "terorîzma navneteweyî" bi hev û din re bilivin û têbikoşin. Bill Clinton ji Tansu Çiller re bi eşkere digot, "Ji niha bi şûn ve wek ku li Awrupayê pêk hat, li Rojhilata Navîn jî di şerê ku li dijî PKK'ê dimeşîne, emê alîkariya KT'ê bikin.

Almanya û Fransa di dawiya sala 93'an de li welatên xwe li dijî sazî û rêxistinên gelê Kurd ên demokratîk, li gorî daxwaza KT'ê liviyan û bi awakî faşîst helwest girtin. Almanya û Fransa bi van helwestên xwe dijminiya xwe li hemberî gelê Kurd ên azadîxwaz diyar kirin. Ev helwest li gorî xwezahiya împeryalîzmê diqewime, ji bo me ne biyanî ye.

Dizanin ku gelê Kurd di welatê xwe de li dijî kedxwariyê û împeryalîzmê vîna hilberînkar, kedkar û mirovahiyê di bin fermana sosyalîzma ilmî de pêk tîne, ji bo împeryalîzmê ev rewşeke nû ye. Ne piştî hilweşandina sosyalîzma real, piştî xetimandina Şoreşa Kewçêrê (october,cotmeh) vir ve rewşeke bi gotina serokatiya PKK'ê Abdullah Öcalan "Şoreşaya Kewçêra Duyemîn" li ber derî ye". Rewş ev e û împeryalîzmê ta girtiye. Di binê biryara ku li Brukselê hatî girtin de ev rastî heye. Ev rastî jî baş dide xuyakirin ku di rijandina xwîna Kurdan de, împeryalîst jî hevparê kedxwariya Tirkiyeyê ne!

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1–Serokê Sendîkaya Petrol–Îş'ê, ji ber axaftineke wî DED dixwaze wî bişîne zîndanê, di wêneyê de tê dîtin 2–Di muzîkê de îşareta rawestinê/ Cihê ku tav lê nade/ Yezdanê Rojê/ Navgîneke ku dar pê tên birrîn 3–Îşaret/ Cejn/ Kêfxweşî 4–Kesê qelew û zikmezin/ Xizanî 5–Cihê ku mirov xwe tê de vedişêre û diparêze/ Cihê mirov tê de dimeşe 6–Bi awayekî îndîrekt vegotin/ Gotina redkirinê 7–Dijwateyê girî (berevajî)/ Navekî mêran 8–Sewaleke ku pê cot tê kirin (berevajî) 9–Kesê ku besteyan çêdike 10–Navê pêxemberê xirîstiyanan/ Fer, rewşen

**Serejêr:** 1–Navê pirtûka Ehmedê Xanî ya herî navdar ku ew pirtûk klasîkeke Kurdî ye/ Navê darekê 2–Bi Tirkî bargeh/ Cawbir 3–Danekî berê beyaniyê/ Kûçik 4–Navekî mêran/ Bi Tirkî hesp 5–Li hin deveran ji rû re tê gotin/ Tiyatro 6–Pêşkêşî/ Ne tûj (Ji bo hacetên birrînê) 7–Dinya/ Bang bi Erebî 8–Madeya ku bi vexwarina wê mirov dimire 9–Cureyekî qralan 10–Navê meha Newrozê 11–Tiştê ku pirr kêm dibe an jî diqewime 12–Hejmarek

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Ferîde/ Laş 2–Edalet/ Isam 3–Raser/ Îbadet 4–Guman/ Şê 5–Ûr/ Misas/ PKK 6–Ramûsan 7–Îde 8–Ercîş 9–Asim/ Îsa 10–ATV/ Êvar

**Serejêr:** 1–Ferfûrî/ AA 2–Eda/ Radest 3–Rast/ Meriv 4–Île/ Mû/ Cm 5–Dergistî 6–Et/ USA/ Şîv 7–Îman/ Sa 8–Libas/ Adar 9–Asan 10–Şad 11–Meşk 12–Têk


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel (Fax) 511 50 07


**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |

## Zîndewer

*Li mînakê binêre û numereya her wêneyî li hember navê wê binivîse!*

| | |
|---|---|
| Mêş | ......4...... |
| Pirpirok | .............. |
| Pirpiroka şevê | .............. |
| Mozqirtik – zerqetik | .............. |
| Mîro – gêre | .............. |
| Kulî | .............. |
| Dûvteşî | .............. |
| Pîrik | .............. |
| Xalxalok | .............. |
| Kêzik | .............. |
| Kurm | .............. |
| Tertûr | .............. |
| Mêşhingivîn | .............. |
| Kermêş | .............. |




## Bila zarok birçî nemînin

Kumekî min ê veşartî hebe û ez dema wî bidime serê xwe û kes min nebîne. Ez dê pere ji zengînan bistînim û bidime zarokên ku birçî ne û malbatên wan tune ne. Kengê hûn bixwînin, belkî bibêjin çima tu pereyê zengînan ku ji xwe re qezenc kirine, distînî û didî feqîran? Ji ber ku zengîn pereyan ji xelkê distînin, an jî tiştên pîs dikin û ew zengîn dibin. Yên din feqîr dimînin. Lê, xema kesekî jî nîn e. Hinek jî hene pereyên wan pirr in. Kesekî wan jî tune. Ew tima dikin. Pereyê xwe nadine kesekî jî. Berî ku ew bimirin dixwazin pereyê xwe bidin dewletê. Lê, ew çima pereyê xwe nadin wan zarokên ku di nav şer de ne û birçî ne? Yên ku rewşa wan ne baş e? Lewma, ez jî dixwazim wiha pereyê wan ji wan bistînim û bidime zarokên birçî û tazî. Ez dixwazim li her derê dinyayê aştî hebe. Şer tune be.

Ez dixwazim tiyatroyeke mezin çêbikim û bi wê pere qezenc bikim. Ji hemû zarokên dinyayê re alîkariyê bikim. Dê hûn bibêjin, dê tu çawa alîkariyê bikî? Ez dê ji wan zarokên ku mal û dê û bavên wan tune û birçî ne re alîkariyê bikim... Ez pereyê xwe biavêjim bankayê. Fayîza wî dê pirr bibe. Îhtiyaciya min bi pere û mal tune. Ez dê bi wan pereyan zarokên birçî û tazî xwedî bikim. Wê çaxê ez û ew dikarin bijîn. Ez dixwazim li temamê dinyayê aştî hebe.

Ez dê pere pê çi bikim? Mala min heye. Pereyên min hene. Meaşê min heye. Dê û bavên min hene...

***Niştîman***
***Pole 9***

## Apê Şarlî

Ez ji fîlmên Apê Şarlî Şaplî gelekî hez dikim. Kincên fireh, kevn û poto lê ne. Mirov dibêje qey şal û şapikên Kurdan in. Kumê wî yê lengerî li nav çavên wî ye. Simbêlê wî kurt û gurr in. Wekî yên Hîtler in. Çav şaşo paşo ne. Çov di dest de ye. Şekalên wî mezin in. Lingên wî xwar in. Ew wekî qazan dimeşe. Lê, wek qazan beza ye.

Tim bûyer bi serê wî de tên. Ew li bin guhê xelkê dikeve û xelk li bin guhê wî.

Ez pirr ji şekal û meşa wî hez dikim. Ez dibêjim navê wî ne Şarlî ye, şahî ye. Mirov dide kenê.



## Dest

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| cîyê dest | D | e | s | t |
| tuwalet | D | e | s | t |
| behane, tiştê dest | D | e | s | t |
| kedî, ji mirov nareve | D | e | s | t |
| îzin | D | e | s | t |
| bêçek | D | e | s | t |
| mecal, îmkan | D | e | s | t |
| mecbûr, stûxwar | D | e | s | t |
| tecawiz, mudaxele | D | e | s | t |
| heqê xebatê | D | e | s | t |
| pê dest ziwa dibe | D | e | s | t |
| xwestî | D | e | s | t |
| aşa bi dest | D | e | s | t |

Hemû gotinên jorîn ên ku di nav çargoşeyên biçûk de ne, ji gotina **dest** hatine çêkirin. Lê, piştî dest me şûna wan vala hişt. Di nav her çargoşeyekê de divê tîpek bê nivîsîn. Wateya (maneya) her gotinê jî li kêleka wê ya çepê hatine nivîsîn. Bi tîpan cihên vala tije bikin.

**Nivîs û wêneyên vê rûpelê ji pirtûka Amed Tîgrîs hatine girtin.**

*Kurdên Başûr yên ku reviyane hatine Stenbolê, rexne li muxalîfên Başûr yên komunîst digirin*

# 'Li Moskovê berf dibariya ew li Kurdistanê dicemidîn'

*Gelê me yî Başûr, ji bo bidestxistina loqek nan, dikeve riyên xeribiyê. Berê xwe dide derve. Lê nizanin li welatên biyan çi şert li hêviya wan in. Pêşiyan gotine, dengê defê ji dûr ve xweş tê. Lê ji nêzikahî ve?*

*Îro li Stenbolê jî gelek kesên ji Başûr hene. Hatine ku herine Awrûpayê. Lê miradê wan pê nebûye. Bi gotinên xweş yên li ser welatên xerib xapiyane. Xwende ne, ronakbîr in, peşmergetiyê kirine bi salan. Lê niha di şertên pirr giran de têdikoşin, tev jî ji bo welatên xwe bi hesret in. Lê dibêjin ku xizaniyê ew mecbûrî vê yekê kirine. Di vê hevpeyvîna duduyan de jî hevalên me rawşa Başûriyan bi awayekî diyar dertînin rastê.*

*Li navçeya Güngörenê di malekê de 22 xortên Başûrî dijîn. Ev xort hin ji wan bi roj, hin wan jî bi şev li malê dimînin. Sedemê vê yekê me ji wan pirsî û me xwest em wan ji nêzîk ve nas bikin.*

*Em dixwazin pêşî we nas bikin.*

– Navê min Saman Elî ye. Ev şeş meh e hatime Tirkiyeyê.

*Ev şeş meh e hûn di vî xanî de dijîn?*

– Belê.. Meha ewil na, lê ev heye pênc meh ez li vir dijîm.

*Sedemê hatina we ya Tirkiyeyê çi bû?*

– Kaka em li Kurdistanê gêj bûbûn, me nizanibû ka em çi bikin. Em jî hatin Tirkiyeyê.

*Ji çi aliyê ve hûn gêj bûbûn?*

– Ya rastî di her warî de em neçar mabûn. Ji aliyê aborî, siyasî heta di warê çandî de jî me nizanibû ka em çi bikin.

*Hûn çi karî dikin?*

– Niha di karistanekê (fabrîke) de dixebitim.

*Meaşê we çiqas e?*


– 2 Milyon e.

*Du milyon têrî we dike?*

– Na wele em deyndar in.

*Çawa çêdibe?*

– Wele nizanim. Tu zanî bira, wexta ku em hatin Tirkiyeyê di programa me de yek; karkirina pereyan, dudo; bi wan pereyan çûyîna Evrûpayê hebû. Lê bi Xwedê ez bi xwe niha deyndar im. Dîsa jî piştî demekê ku em bikaribin emê herin Yewnanîstanê. Ger nebe emê dagerin Başûr dîsa.



***Tu zanî bira, wexta ku em hatin Tirkiyeyê di programa me de yek karkirina pereyan., dudo bi wan pereyan çûyîna Evrûpayê hebû. Lê bi Xwedê ez bi xwe niha deyndar im.***

*Tiştên em dibînin û dibîhîzin ku niha gelek kes dixwazin ji Başûr derên û herin Ewrûpayê. Ku Ewrûpa bi destê wan nekeve tên Tirkiyeyê an jî Yewnanîstanê. Di nav wan kesan de êdî zehf jî, mirovên xwende û ronakbîr tên dîtin. Bi dîtina we, bi vê tewrê, pirsgirêkên Başûr wek aborî û yên din wê bêne helkirin?*

– Niha Kurdistana Başûr ji serî ta dawî di tevlîheviyekê de ye. Kes nizane wê çi bike. Ev yek, ji ronakbîran ta gundiyan di mejiyê herkesî de hin pirsan dihêle. Bi rastî li Başûr bibêje qet kar tune ye. Ev yek jî me mecbûrî derketina ji Başûr dike. Mesele ku li Başûr hûn bixwazin bi seyarî li ser erebokan tiştan bifiroşin, êvaran di TV'yan de yek ji endamê hikûmetê dertê û dibêje: "Ji wan tiştekî nestînin, biha difiroşin, bêşexsiyet in" û hwd. Gel jî li wan mêze dike. Vêca bi çavekî din li firoşkeran dinihêrin. Yan jî hûn bixwazin dovîzan bikirin û bifiroşin, bi eynî metodê dîsa nahêlin. Ê ji xwe karistanên bavê kesî jî li wir tun in ku di wan de bixebite.

*We çawa kar li vir dît? Tu problem derneket?*

**Yaho hûn dizanin ku li Başûr, Tirkiye çawa tê nasîn. Jixwe berê jî birayê min li vir bû, der heqê vir de ez agahdar dikirim. Ê xwezî hûn li Başûr bûna ku wexta yek ji Tirkiyeyê dihate Başûr çi forsek dikir. Digot ez li Tirkiyeyê qral bûm kesî newêribû ji min re bigota siya piyê te xwar e, ez bavê tevan bûm, û hwd. Ji ber ku kincên nû lê bûn, çend pereyên Tirkiyeyê jî di bêrîka wî de bûn û "apê hatî" berdida derewan.**

– Yaho hûn dizanin ku li Başûr, Tirkiye çawa tê nasîn. Jixwe berê jî birayê min li vir bû, der heqê vir de ez agahdar dikirim. Ê xwezî hûn li Başûr bûna ku wexta yek ji Tirkiyeyê dihate Başûr çi forsek dikir. Digot ez li Tirkiyeyê qral bûm, kesî newêribû ji min re bigota siya piyê te xwar e, ez bavê tevan bûm, û hwd. Ji ber ku kincên nû lê bûn, çend pereyên Tirkiyeyê jî di berîka wî de bûn û "apê hatî" berdida derewan. Feqîrên wek me jî digotin: "Waw lawo ma ev çawa çêbû, çima em neçin wê derê?" Dû re yên ku wî nas dikirin çend heb dihatin. Mixabin yên ku li Stenbolê key (qral) bû li wan xwedî dernediket, ji ber ku ew bi xwe jî an firaqşo an jî di febrîkayekê de mehê bi milyonekê dixebitî.

*Keko navê te çi ye?*

– Qenco Osman e.

*Hevalê Qenco hûn li ser rewşa Başûr çi dibêjin?*

– Jixwe heval jî got, bi rastî rewşa Başûr ji aliyê aborî ve pirr xerab e. Malûm e ku rewş xerab be, mirov li çareyên din digere. Ev hevalên han pêşiya min hatibûn vir. Ji min re name şandin û rewşa vê derê ji min re nivîsîbûn.

*Piştî ku we rewşa vir zanibû jî, dîsa hûn hatin?*

– Belê, ez fikirîm. Di name de hevalan digot meaş du milyon e. Li Başûr ji ber ku Dînarên Iraqî erzan e, du milyonên Tirkî gelek dike. Wisa bifikire ku li Başûr ji bo du milyonê Tirkî bi hindikayî divê tu pênc mehan bixebitî. Min jî lê da û ez hatim Tirkiyeyê.

*Rewşa aborî ji bo her kesî wisa ye? An tenê ji bo kedkaran?*

– Na lo... Ji bo herkesî ne wilo ye. Kî dikare wek serokeşîrekî dewlemend bibe, ew hedê kê ye. Tenê ji bo belengazan wilo ye.

*Ku edaleteke durist çêbibe wê çawa be?*

– Bi dîtina min ew jî hel nake vê meseleyê. Niha ku mal û milkên Mesûd Berzanî û Celal Telabanî (hewçend zehf e jî) tev de li gel bên belavkirin jî, dîsa problema aborî ya Başûr çareser nabe. Jixwe ew jî tiştekî wisa nakin, ew pereyên xwe didin serokeşîran ji bo ku alîkariya partiyên wan bikin. Nadin feqîran.

*We jî pêşmergetî kiriye?*

– Belê heft sal. Di nav Partiya Komunîstên Iraqê de. Dixwazim tiştekî din jî bibêjim tu mafên partiyên Iraqê yên çep tune ku rexneyan li me bike û bibêje ji Kurdistanê direvin. Ku ew muxalefeteke baş kiribûna û em mecbûrî vê şerpezetiyê nekiribûna bi tu awayî em ji Başûr dernediketin.

*Qey ji bo we ev tê gotin li aliyê wan ve?*

– Erê. Li gor gotinên ku hevalên ji Başûr tên, radîkalên Partiya Zehmetkêş û yên komunîstan ji bo me wiha gotine. Em jî, ji bo wan vê dibêjin; Wexta ku li Moskovayê berf dibariya û li başûr germa havînê bû, di şûna ku sîwan û pardesoyên xwe li xwe bikirana û derketina bi gotina serma ye, bila mûxalefetê bikirana.

*Wê bidome*

***Hevpeyvîn: Salih Günbat û Pismam***

welat
• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tîgrîs
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık